



Xelil Xemgîn:
"Gelek caran
ji meşhûrbûnê aciz dibim"

► 7



فیلمیک ده‌بارەى ئەفسانەى
شمشالی کوردی

12 ◀




Bexda guh nade
nivîsaren bi kurdi

► 3

Rûdaw

Hejmar: 8
25. Tebax 2009
www.rudaw.net



ÇAPA EWRÛPA

Deutschland, Österreich, Nederland, Belgique, France 1,50 Euro | Schweiz 2,70 CHF | England 1,40 GBP | Sverige 21,00 SEK | Danmark 15,00 DKK

Nr. 8 | 25. August 2009 | Dienstag

Serokê nû yê Kongra Gel Remzi Kartal:

'Çareseriya aştiyane ne karekî hêsan e'



Kawe Emin
Bruksel (Rûdaw) - Beriya demê kurt Remzi Kartal wek Serokê Kongra Gel hat hilbijar-

tin. Di yekem hevpeyvîna bi rojnameyê kurdi re Remzi Kartal ji Rûdawê re bahsa stratejiya bernameya Kongra Gel kir. Kartal di wê baweriyê de ye ku nexşereya Öcalan wê rewşekî nû bine rojevê û dibe ku hin kes nexwazin qebul bikin û red bikin. Kartal nerînên xwe wiha anin ziman: "Em Kurd divê fahmbikin ku çareseriya aştiyane ne karekî wiha hêsan e, divê hem Kurd û hem Tirk dijberî wan kesan bisekinin ku li dijî aştiyê ne."

Kartal herwiha hilbijartinên Başûrê Kurdistanê û Parlamena nû ji piroz kir. ► 8

Profesora Amerîkî:

Erkê Hikûmeta Kurdistanê reform in

Hawar Ewdilrezaq Hewlêr (Rûdaw) - Pispora peywendiyên derve ya Zanîngeha Washingtonê Prof. Carol Olirey ku di heman demê de pispora çand û siyaseta Rojhilata Navin e, dibêje ku rêvebirîya Barack Obama di çareserkirina kêşeya Kerkûkê de bi awayekî cidî tevdiqere. Olirey ku rewş û poli-

tikayên Îraq û Herêma Kurdistanê ji nêzik ve dişopîne li navenda The Global Peace / Aştiya Cihani lêkolîner e û çend caran serdana Herêma Kurdistanê kiriye, herwiha cara dawîn ji bo çavdêriya pêvajoya hilbijartinan hatiye Kurdistanê. Prof. Olirey pişên Rûdawê bersivandin. ► 8

'Kurd ji bo partiya me dilsoz in'



Sharo I. Garip Dortmund (Rûdaw) - Berdevka Karê Hundir a partiya 'Die Linke' Ulla Jelpke di pêva-

joya hilbijartinên li Almanyayê de ji bo Rûdawê axifi. Jelpke diyar kir ku Kurdên Almanyayê ji bo partiya wê dilsoz in û herwiha destnîşan kir ku ewê di pêşerojê de ji piştigiriya Kurdan bike. Jelpke bi bawer e ku di wê herwî hîlbijartinê û wiha dibêje: "Ez gelê Kurd û çar perçeyên Kurdistanê baş nas dikim. Hewl-danên ji bo mafên netewî gelek bî rûmet dibînim."

Wê herwiha Kurdên li Almanyayê ji rexne kir û got ku wan xwe hin ji bi Almanan nedane qebûl kirin û bi giştî ji Kurd dereng dest bi karan dikin. ► 10

Bendava Ilisuyê:

'Armancên bendavê siyasî ne'

Hewlêr (Rûdaw) - Rojnamevan û wênekêşa Fransî An Holmz di serdana xwe ya Îran û Rojhilata Kurdistanê de pêwendiyên xwe bi Kurdan re germ kiribû. Herçiqas An Holmz ji demê kin ve doza Kurd naskiribû, dema di xîfê her bi "Bakurê Kurdistanê" û "Rojhilata Kurdistanê" navê her du parçeyên Kurdistanê bilêv dike.

Heftêya borî An Holmz digel

keçeke Kurd ji Bakurê Kurdistanê bi navê Aypak Taşî ku ji Amedê ye û di şaredariya Batmanê de kar dike, serdana Başûrê Kurdistanê kirin. Ew bi mebesta destpêkirina kampanyayêke hişyariyê ya li dijî avakirina Bendava Ilisuyê hatibûn.

Wekê zanin Tîrkiye ev çend sal in dixwaze li Bakurê Kurdistanê di cihê bajarê dirokî yê Heskifê de bendavê ava bike. ► 8



(Wêne: Rûdaw)

Parlamena nû dest bi karê xwe kir

Hewlêr (Rûdaw) - Piştî Hilbijartinên Serokatiya Herêma Kurdistanê û Parlamena Herêma Kurdistanê, ku di 25 tîrmehê de pêk hatin, Parlamena Herêma Kurdistanê pêncşema borî ji bo rûniştina xwe ya yekê di dewra sêyan de kom bû. Di kombûna parlamenê de ji bîlî Noşîrvan Mîstefa û 2 parlamenterên Lista Goran piraniya parlamenterên dewra nû amade bûn. Mesûd Barzani di rûniştina yekê de sond xwar û ji bo cara duyem bi fermî dest bi karê xwe wekî Serokê Herêma Kurdistanê kir. Wekî din Kemal Kerkûkî ji bo Serokatiya Parlamena Herêma Kurdistanê hat hilbijartin û Ersalan Bayiz ji bû cigirê wî. Firset Amedê ku ji sala 1991ê ve Sekreterê Parlamena Herêma Kurdistanê ye, di sala ji bo vi postî

hat hilbijartin. Li gor agahiyên ku Rûdawê ji çend çavkaniyên berpirs yê Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) û Yekitiya Nîştîmanî a Kurdistanê (YNK) bi dest xistin, PDKê û YNKê li ser postê serokweziriye û dabeşkirina hinek wezaretan li hev kirine. Li gor vê lihevkirinê Berhem Salih ji bo 2 salan dibe Serokwezîrê Herêma Kurdistanê, 10 wezaret dibin para PDKê û 9 ji dibin ya YNKê. Wekî din li ser çend wezaretên sereke ji PDKê û YNKê li hev kirine: Wezareta Navxweyî û ya Pêşmerge ji bo PDKê û Wezareta Darayî ji bo YNKê ne. Wezaretek ji Xirîstiyaniyan û yek ji ji bo Turkmenan hatiye terxankirin. Li ser dabeşkirina wezaretên mayî ji heta niha tu rekeftin tune, lê PDKê û YNKê

têne li ser wê yekê li hev kirine, ku ew wezaret bi awayekî wekhev li herdu partiyên bîndabeşkerin. Herçiqas heta niha eşkere nebuye, ka wê ki ji bo wan postan bîndestnîşan kirin ji, lê çavkaniyekî haydar ji PDKê ji rojnâmeya me re wiha got: "Pir bi dilê PDKê bû ku Bayiz Talabani wek Wezîrê Darayî bimîne û ev nerîna xwe ji YNKê û Bayiz Talabani bi xwe re ji gotiye. Ji bo wergirtina vi postî teklîf li Bayiz Talabani ji hatiye kirin, lê dibe ku Bayiz Talabani nexwaze wi kari bike." Çavkaniya navborî wiha pêde çû: "Mesela postê Wezîrê Navxweyî heta niha ne diyar e, ji ber ihtimalekî mezin heye ku Kerîm Şîngarî bibe cigirê serokê hikûmetê, lê ger nebû cigirê serokê hikûmetê, ew

dibe Wezîrê Pêşmerge ji heta niha biryar nehatiye dayin, ji ber ku çavê gelek perpirsên serbazî yê PDKê li vi postî ye."

Lista Goran û herçar hizbên din ji biryar dan ku wek opozîsyon biminin. Heta niha li ser beşdarbûna Bizava Îslamî ya xwedî 2 kursî û partiyên çep yê xwedî kursiyek biryarek nehatiye dayin, ka ewê başdari hikûmetê bibin an na. Li ser vê mijarê ji çavkaniyekî ji PDKê ev agahî dan Rûdawê: "Ger ew herdu hizbî beşdar ji bibin, zehmete ku postê weziriye bidin wan, lê dibe ku wek cigirê wezîr yan rêveberê giştî wan tevî hikûmetê bikin û eger di hikûmetê de post ji bidin çepan, ewê ji bo baskê Politbüroya Hizba Zehmetkêşan be."

Opera bi kurdî nivîsand



(Wêne: Rûdaw)

Mehmet Sebatli Köln (Rûdaw) - Hunera Kurd bû xwediyê beşeke nûjen. Casimê Wezîr ku Kurdekî ji Gûrcistanê ye, bi kurdi librettoya operayê nivîsandîye. Librettoya ku ji 60 rûpelan pêk tê, jiyana Ewdalê Zeynikê tîne ser sahneyê. Tenorê yekem Ewdal e. Casimê Wezîr niha li benda sponsorekî ye ku wê operayê pêşkeşê temaşevanan bike. Wezîr herwiha li bajarê Kölnê bi 30 şagirtên xwe re amadekariya filmên sinemayê ji dike. ► 11

'Mersûm 37' çî guhert?



Şam (Rûdaw)

Berî demekî li Sûriyeyê di alavên çapemeniyê yê cuda de nûçeyek belav bû. Li gor vê nûçeyê êdî kesên ku kuştinên ji bo namûsê dikin wê rastî cezayên girantir bînd. Kesê ku ev nûçe dixwend yan dibihîst dikete wê baweriyê ku berê li Sûriyê cezayê van kuştinan tunebû û niha ev ceza hatiye destnîşan kirin.

Ango ji berê de ceza heye, lê tiştê nû ev bû ku guhertineke nû kete wê madeyê. Ev guhertin çibû gelo? ► 8

Piştî Sezen Aksu, Chopy jî piştgirî da



Amsterdam (Rûdaw) - Hunermenda Tirk a bi nav û deng Sezen Aksu ji Serokwezîrê Tirk Recep Tayyip Erdoğan re telefon vekir û piştgirîya xwe ji bo hewlên gavavêtina çareserîya pirsgirêka Kurd anî ziman. Gelek hunermendên tirk yê din jî piştgirîya xwe destnîşan kirin. Di vê navberê de ji eniya hunera Kurd jî dengêki bi heman şeweyî derket: Hunermenda ciwan ya Kurd Chopy ji bi armanca piştgirîya pêvajoyê nameyek ji Serokê DTPê Ahmet Türk re rêkir. Chopy di nameya xwe de dibêje ku ew ji bo piştgirîya pêvajoyê amade ye ku di nava çaleki û festivalên ku DTP birêxistin bike, wê bê pere beşdar bibe. Chopy wisa dawiyê li nameya xwe tîne: "Ez dixwazim ji bo aramiya ruhê xwe vî kari bikim."

Pêvajoyê bû mijara karikaturan jî



Stenbol (Diha) - Niqaşên derbarê çareserîya pirsgirêka Kurd de bi berfirehi didomin. Piştî siyasîmedar, sendiqavan, nivîskar û hunermendan kovaren mizahê jî beşdarî pêvajoyê niqaşê bûn. Lê kovaren mizahê zêdetir dubendiyên dewletê radixin ber çavan. Dubendiyên hikûmetê yê ser çareseriyê û astengiyên li hemberî Kurdan berdeyam dikin ji hêla kovaran ve tê rexne kirin û rewş weki, "Odeya makyajê" tê nixkandin. Kovara Girgir, Uykusuz û Penguen bi awayek henekî van dubendiyên rexne dikin.

Girgirê Tigran bi bir xist

Kovara herî bi temkîni nêzîki gaven hikûmetê buyî ji Girgir e. Kovar bawer dîke ku AKP dilsoz nîne. Minak: Destûr nedayina definkirina Aram Tigran li Amedê. Kovar diyar dîke ku naveroka gaven bîn avêtin nayê zanin û wiha didome: "Hikû-

meta AKPê bi gaven çareserîya pirsgirêka Kurd rojev tevlihev kir lê definkirina hunermendê mezin û hostayê mûzîka kurdi Aram Tigran a Amedê asteng kir..." Di kapaxa kovarê de odeyek makyajê ya Serokwezîr R. Tayyip Erdoğan tê de dide. Şewirmendek Erdogan bi lez dikeve odeya makyajê û pîrsa, "Bîrêz Serokwezîr hunermendek me yê mûzîka kurdi yê esilermenî jiyana xwe ji dest daye. Wesiyet kirîye ku li Amedê bê definkirin... Em çi bikin?" di-pîrse. Erdoğan ku di vê navberê de birûyên stûr çê dîke û poşiyekê bi stûyê xwe vedike, bersiva, "Aha cardin pîrs ji cihê ez li ser nexebitim hat" dide.

Dema polis li bi kurdi biaxifin

Kovara Girgirê cih daye gelek nakokiyên axaftinên Erdoğan ên di drokên çûda de pêk hatine. Kovarê bi van axaftinên Erdo-

ğan mafê şiroveyê daye xwendekarên xwe. Kovara Leman jî mijar di manşetê de daye. Kovara Leman bi sernivîsa "Vekirin riya xwe dibîne" cih da mijarê. Kovar cih dide karikaturê Erdoğan ku nexşerîya Rêberê PKK'ê Abdullah Öcalan xistiye destê xwe û Serokomar Abdullah Gül û Wezîrê Karên Hundir Beşir Atalay bi meroqê mezin dibêjin "Ka bide ez ji binêrim!.. "Rûpelekê jî bide min", "Federasyon heye?" Kowar cih dide rexneyê MHPê jî. Di karikaturê Tolga Tuncay de bal dikîne ser mijara feraseta polisên bi kurdi zane û cih dide kurdekî di îşkenceya askiyê de ye. Di îşkenceyê de kurdi dibêje "Ez bê gune me" polis jî dibêje "Lan ne diyorsun ne? (Tu çi dibêje çii?) Ez tiştêki fahmnakim..." Polisêk din dikeve hundir û dibêje "Ka tu xwe bide ali dostê min. Weki polisêki bi kurdi zane ez dest bi lêpirsinê bikim."

Kovarek din Uykusuz e. Vê kovarê jî bal kişandiye li ser taqwiye polîsan a Amedê û sernava, "Midûriyeta Polîsan a Amedê wê polîsên kurdi dizanin wezîfedar bike!" bikar aniyê. Kovar bi vî pekanînen diyalogên wê di navbera amedî û polîsan de derkevin vegotine. Di kovarê de ceza û dozên li dijî kurdi, kes, sor û zeran hatine vekirin ten destnîşankirin û tê daxuyandin ku tekîliya polîsên kurdi dizanin ji ji ya polîsên din cuda nabe.

Tîmên Kurd û Tirk têne hemberî hev



Yaneyax Zaxoyê

Zaxo - Cara yekem e ku timên Kurd û Tirk ên futbolê têne hemberê hev. Armanca herdu timan maceki dostani ye. Ev listika diroki wê roja 26ê tebaxê li Mereşê, di navbera Yaneyax Zaxoyê û Kahramanmaraşspor de bê lidarxistin. Kahramanmaraşspor di 2. Liga TFF 4. Grubê de dilize. Wêk ku Serokê Kahramanmaraşsporê Muhammed Günkut diyar kir, Wezîrê Karê Hundir Beşir Atalay ji jî vî maça dostani agahdar e û gelek kêfxweş e.

Tetwan li ser berikan



Wan (Diha) - Li Navçeya Tetwanê ya Betlisê, Rahmi Aygül, ji heriya bizinan berikên ku nexşeya Gola Wanê û figûrên Çiyayê Nemrudê li ser in çêdike. Ew alikariyek mezin dide

honadin û hind dewlemendtir dibin. Berik ji aliye niştecîhan û turistan ve rasti eleqeyek mezin tî. Di berikan de ku Gola Wanê, Gola Kraterê ya Nemrudê, figûrên herhelên Çiyayê Nemrudê, 5 minareyan Betlisê, kumbetên Exlatê û herwiha diroka heremê û alikariya danasandina xweşkiyên wê yê xwezayî dike. Ligel turistan gelekî saziyên sivil û gelê komeleyen heremê eleqeyek mezin nişani berikan didin. Aygül piştî ku teqawidi bû ji patentê berikên ku çêdike ji girtiye û destnîşan kir ku armanca wî qezençkirina pereyan nîne û da zanin ku bi armanca danasina Tetwanê ya bi cihanê berikan çêdike.

Aygül, diyar kir ku li gori derfetên we yê madi, hilberinê çêdikin û da zanin ku ji ber nebûna derfetên madi hilberinê kên çêdikin û wiha got: "Em van berikan bi zîrarê çêdikin. Tu qezenca me ji vî kari nîne. Dawaza me jî, jiyandina çanda berikan e ku bi salan e ji aliye mirovên me yê li heremê têne çekirin e. Em naxwazin ev kevnareyî me winda bibe."

danasandina navçeyê.

Rahmi Aygüle Tetwani ku ji heriya bizinan berikan çêdike, navçeyê bi cihanê dide nasin. Berikên ku bi heriya bizinan têne çekirin, bi figûrên aidi heremê têne

Rojnameyeke Batmanê ku li 18 bajarên belav dibe:

DURUS

Salihê Kevirbiri

Stenbol (Rûdaw)- Batman li Bakurê Kurdistanê yek ji wan bajarên e ku bi zêdebûna rojnameyên xwe tê naskirin. Bajarek ku di salên 1940-1950'yî de wek gundek dihat naskirin, bi ditin û hilberina petrolê, di nava 30-40 salî de bû yek ji bajarên herî mezin yê cografîyaya Kurdistan. Ligel ku nûtirin bajarek Kurdistan e jî, hema beje temenê rojnamegeriyê bi qasî temenê wê ye. Ev 46 sal in ku li Batmanê rojnamegerî tê kirin. Yekem rojnameya rojane bi navê "Batman Gazetesi" ye û ji sala 1963'yan ve weşana xwe berdewam dike.

Haliha zîrî komek rojname li vî bajarî têne weşandin û belavkirin: Batman Gazetesi, Batman Postasi, Batman Çağdaş, Doguş, Petrol Gazetesi, Batman Times, Mezopotamya, Barış, Vizyon, Batman Umur û Duruş Gazetesi... Tevahiya van rojnameyan rojane ne.

Rojnameyeke du mehî

Dabaşa mijara vî nivîsarê Rojnameya Duruşê ye. Duruş, yek ji van rojnameyan e ku ligel rojane ye, li 18 bajaran tê belavkirin... Bêpîrsên rojnameyê diyar dikin ku wê Duruş, hewlê bide bi sloganê; "Demokrasi, aşti û wekhevîyê" weşana xwe berdewam bike û di vî warî de piştevaniya van nixkariyan Naveroka wê siyasî-çandî-

hunerî ye; bi ebadên xwe tabloid e, ji 8 rûpelan pêk tê û 2 rûpel jê rengin in. Duruş, nêzîki 3 hezar heb tê çapkirin û belavkirin.

Rojnameya rojane Duruş, li Batmanê çap dibe û li bajarên weki Diyarbekir, Mêrdin, Sêrt, Wan, Riha, Colemêrg, Mûş, Agirî, Qers, Îdir, Semsûr (Adiyaman), Dilok (Entab), Dêrsim, Meletî, Erzerom, Erzincanê tê belavkirin.

Di kunyeyê de navekî naskirî: Huseyin Kalkan

Duruş, rojnameyek e nûhati û pir ciwan e. 1-ê Hezîrana 2009'an dest bi weşanê kiriyê, bi gotineke din rojnameyê du mehî ye. Lê belê tê saloxdan ku ji niha ve mohra xwe li pêşketin û qewimînên li heremê xistiye.

Dema me bala xwe da kunyeya rojnameyê, navekî naskirî li ber çavên me ket; Huseyin Kalkan. Kalkan, kevneşaredarê Batmanê ye û Xwediyê İmtiyaz yê rojnameyê bixwe ye. Herçî Mustafa Seven e, Gerinendeyê Giştî yê Rojnameyê ye...

Dr. Işık İçsanlı, Gunay Aslan, Hasret Birsal, Yener Orkun-oglu, Avasin Yorulmaz û Mustafa Seven çend nav in ku di rojnameya navborî de niviskariyê dikin. Avasin Yorulmaz, hem nivîskar, hem gotûbêjçêker, hem jî editorê beşê çand û

hunerê yê rojnameyê ye...

Weşaneke serbixwe û demokrat

Em ji Yorulmaz dixwazin ku ew li ser xeta weşana rojnameyê çend agahi bide: "Ji ber ku rojnameyên heremî weki dibistanên demokrasiyê têne nixkandin, ji rojnameyên neteweyî demokratî in. Dewlet, rola rojnamegeriya nûçeyên protokolê û nivîsên li ser 'kêzik û beyaran' daye rojnameyên heremî. Lê belê rola rojnameyên heremî di hêla sivilîzasyon û demokrasiyê de ji rola rojnameyên neteweyî zêdetir e. Di rojnameyên heremî de, ji her derdor û civakê kes dikarin fikrên xwe diyar bikin..."

Yorulmaz diyar dike ku ligel hejmara wan zêde ji be, rojnameyên li Batmanê rojnamegerîyê lêkolîner û wêrek nakin û weha berdewam dike: "Nûçeyên rojnameyên din bi giştî li ser protokolê ne. Gelek rojname jî, ji bo berjewendiyên madi nûçeyan diweşandin û nivîs çap dikin. Helbet Duruş jî, ticarî ye, lê belê xwediyê politîka û xeteke serbixwe û demokrat e. Rojnameya Duruşê di warê çand û hunerê de ji xwedî idia ye. Duruş, çanda Kurdan diparêze..."

Kesên ku bixwazin ji nûçe û nivîsarên rojnameyê agahdar bibin: www.durushaber.com

Rûdaw

Xwedi: Rudaw Media GmbH · **Serokê Civata Birêvebir:** Nûredîn Weysî · nuradinwaisi@rudaw.net · **Sernûser:** Ako Mihemed · akopress74@yahoo.com · **Rêvebirê Beşa Kurmancî:** Faysal Dağlı · faysaldagli@rudaw.de · **Rêvebirê Beşa Soranî:** Hêmin Ebdulla · hemen@rudaw.nl · **Navnîşan:** Rudaw Media GmbH · Gutenbergstr. 63a · 50823Köln/Almanya · **Telefon:** +49 (0) 221.26 00 40 02 · **Telefax:** +49 (0) 221.26 00 49 81 · **Web:** www.rudaw.net · **E-mail:** info@rudaw.de (Beşa Kurmancî) · **E-mail:** rudaw@rudaw.net (Beşa Soranî)

Bexda guh nade nivîsarên bi kurdi

Rewa Ebdula Hewlêr (Rûdaw) - Li Başurê Kurdistanê û bajarên Iraqê Kurden ku dixwazin seri li saziyên fermi bidin, rastê astengi û zehmetiyên cur bi cur tînin.

Heftiya bori Kurdekî bi navê Mehmûd xwest ku li Mûsilê otomobîla ku nû kiriyê li ser navê xwe qeydbike. Lê karmendên idareya hattûçûna Musilê wekaletnameya Mehmûd qebûl nakin karê wî cibicîh nakin. Mehmûd neçar dibe li Mûsilê-wekaletnameyêki din çêbibe: "Em xwe bi Iraqî dizanin û li gordestûrê di herêma me de zîmanê kurdi bi fermi hatiye nas-kirin."

Dadnîvîsiya Hewlêrê yek ji wan idareyên qerebalix e ku rojana gelek kes bi mebesta wekaletnameyên taybet, giştî û belgenameyên hemû curî ji Hewlêr û bajarên din ên Iraqê serdana wê dîkin. Li gel wê yekê ku ew idare wekaletnameyan bi awayekî qanûnî tanzim dîke û bi zîmanê erebî bo idareyên parêzgehên din ên Iraqê dişîne, lê pir car baweri bi wan nayê kirin.

'Musil û Kerkûk guh nadin me'

Ji idareya dadnîvîsiya Hewlêrê, Çiraxan Mihemed, dibêje hinek bajarên Iraqê û bi taybetî ji idareyên Mûsil û Kerkûkê guh nadin belge û nivîsên wan: "Eger em wekaletnameyan bi kurdi binivîsin, girîngî nadin. Lewra bo neragirtina kar û barên xelkê em bi erebî dinivîsin. Lê li gel wê yekê ji, baweri bi nivîsarên me nakin û nivîsa piştrastkirinê ji me dixwazin. Lewra me ji biryar standiye bi heman awayî her nivîsêki ji wan gihişt destê me, ger nivîsa piştrastkirinê ji me re neşînin, em qebûl nakin."

Li gor destûra Iraqê, Herêma Kurdistanê Herêmeke fermi ya idari ye û zîmanê kurdi ji zîmanê dîyem yê Iraqê ye. Lewra divê idareyên bajarên Iraqê baweriye



bi nivîsarên fermi yên Herêma Kurdistanê bikin û di idareyên xwe de wergêran deynin.

Di wê derbarê de, Sekreterê Civata Wezîrên Herêma Kurdistanê ji Rûdawê re wiha dibêje: "Ma fê herdu aliyan e ger gumanekê ji her nivîsarêki hev bikin, ji ber ku heta niha sextekari ji nivîsan li Iraqê maye. Lewra ji bo piştrastbûn li ser rastiya nivîsan ew yek tiştêki normal e."

Dadnîvîsiya Hewlêrê, Çiraxan Mihemed sedemên redkirina nivîsên kurdi û bêbaweri bi nivîsarên din, bi kêşeya siyasi ve girêdide: "Ew pirsgerêkeki siyasi ye. Ji ber ku em bi erebî ji nivîsarê ji wan re dişînin, disa ji baweriye bi nivîsarên me nakin û piştre nameya piştrastkirinê ji me dixwazin."

Di wê navberê de hevvelatî ji wê kiryarê zirar dibinin. Riyaz Ebûdê 28 salî, niştecîhê Bajare Mûsilê ye û karê kirin û firotin û binavkirina otombîlan dik bazarê dike. "Em her nivîsêkê binin, divê careke din vegerin heman idareyê ji bo ku nameya piştrastkirinê bo ni-

visa yekem binin. Ji ber wê yekê gelek xisar digihe me."

'Nivîsara kurdi mafekî desturî ye'

Qasim Cemil ku 12 salan di idareya dadnîvîsiya Hewlêrê de kar dike, ji Rûdawê re dibêje ku tenê li bajarên Herêma Kurdistanê kar bi nivîsarên kurdi tê kirin: "Heta hinek nivîsarên sexte nehatin girtin, tu aliyeke daxwaza nameya piştrastkirina nivîsan ji hev nedikir. Lê niha baweri bi tu nivîsarêkê bê nameya piştrastkirinê nayê kirin."

Ji aliyeke din jî, Endamê Civata Niştîmanî ya Iraqê û Endamê Lijneya Rêvebirina Destûrê û Lijneya Darayî ya Iraqê ya Lista Hevpeymanî Kurdistanê, Samî Etroşî, dibêje di çend salên bori de nûnerên Kurd li Bexdayê bi kêmi li ser cibicikirina maddeyên destûrê kar kirine. Li gor Etroşî bi taybet li ser fermikirina zîmanê kurdi di nivîsaran de neşopandine. Herwiha Etroşî dibêje sandîna nivîsaran bi kurdi mafekî desturî ye û organ û dezgehên Bexda nikarin wan nivî-

san red bikin: "Di warê destûrê de zîmanê kurdi piştî zîmanê erebî dîyem zîmanê fermî ê Iraqê ye, lewra tu idare û dezgeheke hikûmetê nikare nivîsarên kurdi red bike, yan baweriye bi wan neke û daxwaza nameya piştrastkirinê bike."

Li gor Sekreterê Civata Wezîrên Herêma Kurdistanê Mihemed Qeredaxî, ji bo cibicikirin û rêvebirina kar û baran, ne girîng e nivîsar bi kurdi an ji bi erebî be: "Heta niha me pêwîst zaniye nivîsaran bi kurdi bo Bexdayê binivîsin." Navbiri dibêje heta niha wan di Civata Wezîrên de her nivîsarêk ji bo Civata Wezîrên Iraqê yan idare û dezgehên din şandibe, bi zîmanê erebî şandine.

Nivîsarên bi kurdi rûmet nabînin

Derbarê şandina bi kurdi ya nivîsarên Hikûmeta Herêma Kurdistanê bo Bexda, Qeredaxî bi pêkenin ve dibêje: "Ger em nivîsan bi kurdi binivîsin, divê em destpêkê hewla wê yekê bidin hemû Iraqê hîni zîmanê kurdi bikin. Ji ber ku ew nîzanin bi kurdi bixwinin. Eger çi li destûrê zîmanê kurdi, zîmanê fermî yê dîyem ê Iraqê ye, lê behsa wê nehatiye kirin divê nivîsar bi kurdi ji bo Bexda bîn nivîsin."

Berevaji Mihemed Qeredaxî, Etroşî bi pêwîst dizane niha pê re hikûmeta herêmê li dêlva zîmanê erebî, nivîsarên xwe bi kurdi bo Bexdayê bişîne, hikûmeta Bexdayê ji di wan idareyan de ku pêwendîya rasterast bi Herêmê re heye, wergêran danên. Etroşî axaftina xwe wiha qedand: "Li gor destûrê li ser hikûmeta Bexda pêwîst e hemû nivîsarên ku mohra dezgehên hikûmeta herêmê bi ser ve be, fermî nas bike, eger her nivîsarêki wî awayî ji hate redkirin, hikûmeta herêmê bikaribe gilînameyê pêşkêşî Dadgeha Federal a Iraqê bike."

Li Kurdistanê rojnameya hikûmetê nayê belavkirin

Îsa Abdulqehar

Hewlêr (Rûdaw) - Rojnameya bi navê "Weqaiyê Kurdistan" rojnameyêki fermî ya Hikûmeta Herêma Kurdistanê ye û naveroka wê bi giştî li ser guherîna nû yên di yasayên Herêmê de ye. Ji sala 2000'an ve 104 hejmarên ve rojnameyê hatine çapkirin û tiraja wê ji 1500'in.

Redaksiyona rojnameyê li avahiya nû ya Wezaretê Dadê de ye. Lê belê ji ber elaqeya ji bo rojnameyê di asta neyînê de ye, birêveberên rojnameyê ji rewşê ne razi ne. Tiştê herî balkêş ji ewe, ku ne parêzer, ne kolejên yasayan û ne ji dozger elaqeyê ji bo vê rojnameyê nişan nadin.

Cigirê birêveberê giştî yê rojnameya "Weqaiyê Kurdistan" Şivan Sabîr rewşa rojnameya xwe wiha şîrove dîke: "Dema yasa ji hêla parlemenê ve tîne guhertin, ew bi awayekî rasterast di rojnameya me de tîne weşandin. Lê belê ji ber dadwer rojnameya me naxwinin, beşî haya wan ji yasayên nû hebe, ew biryarê xwe li gora yasayên kevînin didin." Sabîr li ser vê yekê wê nimûneyê jî dîde: "Vê dawiyê li Kellarê tiştêki bi vi rengî qewimî. Ji ber haya dadwer ji guherandina yasayê nebû, wî biryarek li gora yasaya kevînan ya ku êdi ne derbas-dare da."

Rojname tenê li hinek deverên girêdayî hikûmetê tê belavkirin û Şivan Sabîr sedemê kêmbelavkirinê dixwe Wezaretê Dadê: "Sedemê kêmbelavkirinê ewe, ku Wezaretê Dadê hevkarîya ji bo belavkirina rojnameyê bi me re nake."

Rêvebirê giştî yê Diwana Wezaretê Dadê Hakim Elî bi xwe di nêrineke din de ye û dibêje ku pêwîstiya belavkirina rojnameyê nîne: "Malpera me ya internetê heye û kesên bixwazin li ser guherîna yasayî yên nû agahdar bibin, dikarin bi riya malpera me hemû agahdariyan bi dest bixînin. Ji ber wê yekê pêwîstiya rojnameyê nîne."

Kesên xwediyê heman nêrinê gelek in. Parêzer û endamê parlamena Kurdistanê Tariq Cambaz jî yek ji van kesê ye û dibêje bila her kesê pêwendîdar ji malperê agahdariyan bîstine. Rojnameya "Weqaiyê Kurdistan" berê li bazarekî ji dihat firotin û heta radeyekî elaqe ji bo wê hebû, lê ev sê salin ku rojname li firoşgehan ji nayê belavkirin.

Li Duhokê 758 jî ser banî ketin

Duhok (Rûdaw) - Li gor îstatistîkên Bîngeha Tendirustîya Duhokê di heft mehên bori de 418 jin û 758 mîr li wî bajarî ji cihên bilind ketine xwarê. Di wê derbarê de Birêveberîya Nexweşxaneyê Emergency li Duhokê ji Rûdawê re wiha diyar kir: Di heft mehên bori de 824 hemwelatî di bûyerên trafikê birindaran bûne û serî li nexweşxaneyê dane. Ji wan 530 mîr û 294 jin bûn. Rêveberîya Tendirustîya dihebe ku di rastiye de hejmara birindaran ji 943 bêhtire, ji ber ku hîni hemwelatî dema birindaran dibin û birîna wan sivik bin, ew naçin nexweşxaneyan. Her wiha tê ragihandin ku di heft mehên de 92 hamwelatî bi gulean birindarbûne (74 zilam û 18 jin), 12 hawlatî bi kêran û 141 hemwelatî jî bi teqînan birindaran bûne. Wekî din jî sedema 'bi xwarinê ketinê' 79 kesên seri li wan dane. Li gorî agahiyan Rêveberîya Trafikê di 7 mehên bori de 415 bûyerên trafikê çêbûne û 47 welatiyan jî jiyane xwe ji dest dane.

Dr. Sedî Berzencî:

Kurd amadekariya hîlbijartinên nû dîkin

Firyad Mihemed

Hewlêr (Rûdaw) - Cigirê Serokê Fraksyona Hevpeymanî Kurdistanê li Parlamena Iraqê Dr. Sedi Berzencî ragihand wê di hîlbijartinên dahatû yên Parlamena Iraqê de hevalbendîyê bi aliyan siyasi yên Iraqê bikin ku mafên netewî yên Kurdan qebûl dîkin.

Li gor Dr. Sedi Berzencî, di hîlbijartinên dahatû yên Parlamena Iraqê de ne girîng e aliyan siyasi yên Kurdistanê bi yek liste an listeyên cuda beşdar bin: "Girîng ew e li Bexda gotar û helwesteke me ya hevgirtî ya siyasi hebe."

Ligel nêzîkbûna hîlbijartinên Parlamena Iraqê ku biryar e di 16ê çîlaya paşîn a 2010'an de bîn encamdan, bo girêdana hevpeymanîyan, aliyan siyasi ketine tevgere. Hevpeymanî Kurdistanê jî tekez dîke ku her aliyeke maf û destkeftên Kurdan li Iraqê qebûl bike û mafên Kurdan bipejirine, bi wan re hevalbendîyê çêdike. Di wê derbarê de Dr. Sedi Berzencî wiha axifî: "Baweriya Hevpeymanî Kurdistanê bi demokrasîyê heye û ew mafên di destûra daimî de hatine pejirandin, divê bîn cibicîh kirin, her aliyeke Iraqî bê merc bi wan nerîna me razi be, em

amade ne pê re hevpeymanîyê girê bidin."

Beşekî jî Endamên Civata Bilind a Îslamî û Partiya Dawe baha çekirina hevalbendîya ligel Lista Kurdistanî dîkin. Berzencî jî behsa nêzîkbûna fikir û ramanên navbera herdu aliyan dîke û nerîna xwe wiha tîne zîman: "Bê guman hevalbendîya Hevpeymanî Kurdistanî bi her yekî jî Encûmenê Bilind a Îslamî, Partiya Dawe û Partiya Îslamî ya Iraqê re heye. Herwiha em bi Lista Raqiye re jî danûstan û gotûbêjan dîkin, em rê li ber tu aliyeke jî nagirin ku bi me re hevalbendîyê çêbibe."

Berzencî Dezza Hilbijartinên PDKê Cefer Êminkî, di hevpeyînekê de ku di jimara bori ya Rûdawê de hat belavkirin, got ger Kurd bi yek list û hevkarîkirîneke zêde tevî Hilbijartinên dahatû yên Parlamena Iraqê bibin, dikarin 65 kursiyên bidest bixînin.

Derbarê hevpeymanîkirina bi aliyan Iraqê re jî wiha axifî, bo hîlbijartinê tenê em hevalbendîyê ligel aliyan Kurdistanî çêdîkin, lê piştî hîlbijartinê emê bi aliyan Iraqî re jî hevpeymanî durîst bikin.

PDK û YNKê biryar dane wê carê jî bi listeyekê beşdarî Hilbi-

jartinên Parlamena Iraqê bibin. Lê çend aliyan Kurd ên din biryar standine bi listeyên serbixwe beşdar bin. Hinek çavdêrên siyasi wê dabêşbûnê bo Kurdan li Iraqê wek metirsî dibinin. Lê Sedî Berzencî bi awayekî din difikire: "Ne girîng e em bi yek liste yan listeyên cuda beşdar bin. Girîng ew e her listeyekî digihe civata nûnerên Iraqê. Bi yek deng û grûb û armanc berevaniyê li mafên netewî me bike, ger wiha nebe, Kurd zirarê dîkin."

Şirovekarên siyasi yên rewşa Iraqê dibêjin ku peywendîya navbera Kurd û Ereban li Iraqê wek bombeyekê ye ku hindik maye biteq. Li gel wê yekê Hevpeymanî Kurdistanê tekez dîke ku pirsgerê hene. Lê Dr. Sedi Berzencî wê nerîna pesend nake: "Di van nerînan de hinek zede-gavî tîn ditin, lê li hinek herêmên tundtûji heye."

Berzencî sedema wan tundtûjiyan jî bi hinek Baasiyên kevînan ve girêdide ku di nav polis û artêşa Iraqê de ne: "Ew liv û tevgere nebaş dîkin, bi taybet li herêma Celewla. Di wan deveran de Kurdan neçar dîkin dest ji mal û milêkê xwe berdin û ber bi cihêki din biçin. Lewra daxwazê ji Hikûmeta Iraqê dikim wan kesan binin nav artêşê ku bi

rasti dizoşê Iraqê bin."

Piştî aliyan Sunnî tevî hilbijartinên civata parêzgehan bûn, niha behsa wê dîkin ku divê di hîlbijartinê wê carê de postê serkomar jî wan re be. Kurd jî li ser wergirtina dúbare ya wî postê pîdagiriyê dîkin: "Niha dema wê yekê nehatiye em behsa postê serokkomariyê bikin, lê Lista Hevpeymanî Kurdistanî li ser wê yekê pîdagir e serokkomar Kurd be."

Niha di Civata Nûnerên Iraqê de 53 kursiyên Hevpeymanî Kurdistanê û 5 kursiyên Yekgirtû ya Îslamî hene. Hinek çavdêrên siyasi dibêjin di hilbijartinê wê carê de wê Kurd jî jimara niha kêmtir kursiyên bidest bîne.

Dr. Sedi Berzencî da zanin ku jimara kursiyên bidest tinin bi beşdarbûna hevvelatîyan Kurd ve girêdayî ye di hilbijartinan de û axaftina xwe wiha qedand: "Nabe rikeberiyên navxweyî û kêmasiyên Kurdistanê di dengdana me bo civata nûneran de bandorê danine û reng vedê. Ji ber ku ev dibe metirsîyêki mezin. Çûnki çiqasî di civata nûneran de Kurdan kursiyên zêde hebin, pîgeha Kurd bihêzîr dibe."

Polîs û Kerkûkê hevdu bi xemsariyê tawambar dîkin

Ako Mihemed Şivani

Kerkûk (Rûdaw) - Ev demek dirêje ku Kerkûk jî bo çalakîyan tûndwari buye bajerekî tirsê. Mihemed Reşîd ku mamostayê Xwendegê destpêkê li taxa Azadî ya li bajarê Kerkûkê ye, hestê xwe li ser vê tirsê û herwiha nêzîkbûna polîsan ya li ser bûyerên bi vi rengî wisa dibêje: "Em ji nişkan ve dengên bilind dibihîsin û ew deng bi dehan kesan bi xwe re dikujin. Polîs gelekî xemsar in. Ew herdem piştî teqînê digihin cihê buyerê. Ji xwe hatina wan jî êdi feyde nake. Eger ev rewş wisa dewam bike, wê hejmara şehîdên me nêzîkî yên Cezaîyê bibe."

Di encama teqîna roja 6ê tebxê ya li taxa Rehîmava pênc kes hatin kuştin û pêşiya hingî jî di teqîna 1ê tebxê de ya li taxa Azadîyê 2 hemwelatî hatin kuştin û 18 jî birindaran bûn. Birêveberê Polîsê Qeza û Nahiyên Kerkûkê Emîd Serhed jî ji bo Rûdawê axifî û wî jî wê carê hemwelatî bi xemsariyê tawambar kirin: "Heta niha Kerkûkiyan ders jî van hemû teqînan dernaxistin û xemsar in. Terorîst jî li derfetan digerin, ji bo bêhtir teqînan pêk binin."

Balkêşe ku li taxên Kurdan di nava demeye kurt de du teqînên ku encamên giran bi xwe re anin pêk hatin û li ser wê yekê hem polîs û hem jî hemwelatî hevdu bi xemsariyê tawambar dîkin.

Kerkûk bi serê xwe buye navenda pirsgerêkeke navnetewî. Rêxistina Al Qaidayê hewlên mezîna dîde xwe, ji bo ku teqînan li Kerkûkê pêk bîne. Ji hêla din ve li gor hinek şîroveyan Hikûmeta Navendî ya Iraqê bi xwe jî dixwaze êrişên li Kerkûkê mezintir bibin, ji bo bikaribe artêşa xwe li wir bi cih bike. Wekî sedema jî ewê wê yekê nişan bidin, ku polîs nikarin Kerkûkê biparêzin. Herwiha hêzên ereb û yên Turkmên jî di henam çarçoveyê de tevdiqirin.

Qadir li ser buyeran dibêje ku hejmara teqînan li seranserî Iraqê bilind buye û wiha pê de diçe: "Ji ber pêşigirtina buyerên bi vi rengî pêwîstî bi hevkarîya welatîyan û hêzên polîsan heye." Qadir sedemê tawambarîkirina hemwelatîyan ya bi xemsariyê jî wisa bilêv dîke: "Başê, dema otomobileke nenaskirî diçe cihêki ku gelek mirov lê ne û li ser wê yekê polîs neyê agahdar kirin, eger ev ne xemsarî be, naxwê çîye?"

Nexşerêya Öcalan tansiyona Tirkîyeyê bilind dike

Hêmin Xoşnaw

Hewlêr (Rûdaw) – Heftaya bori roja 19'ê tebxê parêzerên Rêberê PKK'ê Abdullah Öcalan xwestin herin girava Îmraliyê lê belê di nava behrê de ji ber ku "kosterî Îmraliyê xera buye" mecbûr man vegeyriyan. Parêzeran di heman rojê de serî li Dozgeriya Komarê ya Gemlikê dan ku destûr bistin roja inê herin hevditina Öcalan. Lê ev daxwaz disa bi gotina, "Koster xerabe ye" nehat qebûl kirin.

Parêzerên Öcalan li gor biryara CPT'ê dikarin hefteyê carekî pê re hevditin çêkin. Ev ji roja çarşemê ye. Ji parêzerên Abdullah Öcalan Hatice Korkut ji Rûdawê re ragihand ku li gor biryara CPT'ê dema ku parêzer roja çarşemê nikaribin herin Îmraliyê, dikarin roja pençemê an jî inê herin. Korkut bibirani ku, wan destur ji Dozgeriya Komarê ya Gemlikê nestendiyê ji ber vê yekê hevditin dimine 26'ê tebxê. Korkut wiha axifî: "Em nizanin ku Öcalan roja çarşemê wê nexşerê ya xwe diyar bike an neke." Öcalan di hevditina dawin de ji parêzerên xwe re gotibû ku "Ka em temaşê bikin wê dewlet gavên çawa bavêje."

Li aliyê din xalên eşkere yê nexşerêya Öcalan ji niha ve rojêya Tirkîyeyê germ kir. Ji bilî Partiya Cîvaka Demokratîk (DTP), hikûmeta Tirkîyeyê û pîraniya partiyên siyasî bi awayekî tund nexşerê ya Öcalan red dikin û wê li ser yekîtîya xaka Tirkîyeyê wek xetereki dinirxînin. Nexşerêya Abdullah Öcalan li gor daxuyaniyên parêzerên wî ji Kurdan daxwaz dîke ku Komara Tirkîyeyê nas bikin, li beramberî ji daxwazê ji Dewleta Tirkîyeyê mafên demokratîk yê



Parlamenê DTP'ê yê Batmanê Bengî Yıldız

gelê Kurd misoger bike. Ji aliyê idarî, Öcalan pêşniyara jî nûh ve rêxistinîkirina Tirkîyeyê dîke û dixwaze bo herêman desthelat bê dayin. Vê pêşniyara Öcalan ku gotûbêjan li gel partî û rêxistin û saziyên civaka sîvil û pêkhatên cuda yê Tirkîyeyê herêm bibin xwediyên hêzên parastin û



Berdevkê CHP'ê Mustafa Özyürek

bergiriyê yê taybet, reaksiyona tundtirin û gotûbêjên germ anin holê.

Reaksiyona yekem li beramberî nexşerê ya Öcalan ji aliyê Wezîrê Navxwe yê Tirkîyeyê Beşîr Atalay ve hat nişandan. Atalay di derbarê proseya "Vebûna Kurdî" de danûstandin û

dîkir. Wezîr Beşîr Atalay di derheqê nexşerê ya Öcalan de wiha got: "Muxatabê me yê proseya vebûna Kurdî gel bi xwe ye. Me berê jî gotibû ev kar yê dewletê ye, lewma pêwîst e hemû kes xwe ji helwestên nakokbar ku dibin sedemên ji destdana vebûna Kurdî, dûr bigirin."

Herwiha, Serokkomarê Tirkîyeyê Abdullah Gül jî di derbarê nexşerê ya Öcalan de ji rojnamevanan re axifî: "Îmralî ji bir bikin. Öcalan dereng maye û di vê proseyê de em wî muxatab nagirin. Li Tirkîyeyê pîrsîgîrêkî heye, herkes hewl dide xwe bi xwe pîrsîgîrêkî xwe çareser bike. Ger dewlet însiyatîfê negredest û pîrsîgîrêkî xwe çareser neke, hinek alî wê derfête qazanc bikin û bo bîcanîna armançên xwe bikar binin."

Wek dihat çavêkirin jî, li beramberî nexşerê ya Öcalan herdu partiyên opozîsyona Tirkîyeyê CHP û MHP'ê reaksiyonên tund nişan dan. Berdevkê Partiya Gel a Komarxwaz (CHP) Mustafa Özyürek bo Rûdawê axifî û diyar kir ku nexşerê ya Öcalan projeyê parçekirina Tirkîyeyê ye.

Rayedarên MHP'ê berê rexneyên xwe dan AKP'ê. Parlamenterê MHP'ê Oktay Vural jî rojnameyên Tirkîyeyê wiha daxwiyand: "Pensendîkirina pêşniyaran rêxistîneke terorîst listin û sivikîdîna millet e. Divê kesên vê dikin hinekî ji xwe şerm bikin. Kesên çaverêya nexşerêya Öcalan dikin û kopîya wê tinin û li ser dixebitin divê ji xwe şerm bikin. Niyeta parçekirina Tirkîyeyê eşkere bûye êdî ne tiştêkî veşartî ye."

Berevajî hêzên siyasî yê Tirkîyeyê, DTP'ê nexşerêya Serokê zîndankirî yê PKK'ê Abdullah Öcalan jî bo çareserîna Pîrsa Kurd baş dibîne. Parlamenterê DTP'ê Bengî Yıldız bo Rûdawê wiha axifî: "Rêzdar Öcalan pêşniyara partiya me ya di derbarê otonomîya demokratîk de rast û li gel modela Ewrtipê guncav dibîne. Berhevkirina wê bi sistema wîlayetan re ne rast e. Sistema ku li Îtalya û Spanya tê meşandin modelêkê çareseriyê jî derveyê federalîzmê ye. Lê di awayê çareseriyê de, dewleta navendî besêke zêde ji desthelatîya xwe ji rêberiyên herêmi re dihêle. Ji bilî meseleyên artêş û bergiriyê desthelatên din dibin para herêman."

Li aliyê din berpîrsên AKP'ê jî li xwe mikur tî ku muxatabê wan bo ditîna çareseriyê ne Öcalan e. Serokê Frakîsyona AKP'ê li Parlamenê Tirkîyeyê Bekîr Bozdağ di hevpeyivînekê bo Rûdawê wiha got: "Parlamena Tirkîyeyê biryarê dide. Parlamento, Komara Tirkîyeyê damezrandîye û ew xwediyê îradeya çareserîna wê pîrsîgîrêkî ye. Me berê jî diyar kiribû ku tu rêxistîneke ne yasayî di vî pîrsê de muxatab nayê girtin. Çareserî jî aliyê millet tê kirin. Proseya çareseriyê di çarçova siyaseta dewletê de birêve dîçe."

Li gor hin şîrovekar û siyasemedaran jî, di nexşerêya Öcalan de nehevsiyayî heye. Pîsporê karûbarên siyasî yê Zaningeha Ençerê, Baskin Oran ve nehevsiyayî wek tiştêkî normal li qelem dide û bîngeha wê vedigerîne dewletê û domdike: "Öcalan bi tenê kanala TRT dimîne. Nûçeyên rast di derbarê rewşa Tirkîyeyê de nabihîze û qedexeyê tukesî bibîne, lewra dewlet jî van şaşîtiyên Öcalan berpîrsyar e. Ji aliyekî, Öcalan daxwaza federalîzmê nake, lê ji aliyê din daxwaza çêkirina hêzên taybet bi rêberiyên herêmi dîke. Gelo hêzên bergiriyê tî ku wateyê? Bi bawerîya min tî wateya dirustkirina hêzên leşkerî û polîsan. Ev ne wek sistema federe ya Amerika ye. Li Amerika jî artêş federe ye. Herwiha Öcalan jî aliyekî ve sistemeke federe red dîke lê ji aliyê din pêdagiriyê li ser yek alî û yek dewleta navendî dîke û bi ser de jî dibêje 'divê hêzên bergiriyê yê Kurdan hebîn'. Şaşîti di vîr bi xwe de ye."

'Hikûmet naxwaze Öcalan nexşerêya xwe berî eşkere bike'

Amed (Diha) - Serokê Baroya Amedê Mehmet Emin Aktar astengkirina hevditina bi Rêberê PKK'ê Abdullah Öcalan re ya bi hinceta, "Koster xerabe ye" nîrxand û got ku Hikûmeta AKP'ê naxwaze Öcalan nexşerêya xwe berî hikûmetê eşkere bike. Berdevkê KCD'ê Hatîp Dicle jî diyar kir ku hevdarîna di demê kin de hevditin pêk bê.

Serokê Baroya Amedê Mehmet Emin Aktar ku astengkirina hevditînê, diyar kir ku, "Koster xerabe buye" bihane ye û wiha domand: "Ku hincet nebûya jî bo pêkanîna hevditînê dikarin vasîteyek din peyda bikirina. Hikûmet heta xebata xwe aşkera neke, naxwaze Öcalan nexşerêya amadekirî eşkere bike. Di encamê de pêk nehatine hevditînê xizmeta pêvajoyê nake."

Berdevkê KCD'ê Hatîp Dicle jî diyar kir ku bi rastî nizanin ka koster xerabe ye an na. Dicle bi bir anî ku jî tecrûbeyên berê jî dizanin ku hinceta, "Koster xerabe ye" ne di cih de ye: "Hêvdarîm ku hevditîn di nav 2 rojan de pêk bê. Em di pêvajoyekê hasas de derbas dibin. Ji ber vê yekê ez naxwazim li ser ihtîmalan nîrxandinan bikim. Divê em bi sebir li benda pêşveçûnan bin."

Dezgehên Kurdan çî difikrin?

Fehmî Balayî

(Serokê Enstîtûya Kurdî ya Almaniyayê)

Ez bi gotîna Mir Celadet Bedîrxan dest pê dikim: "Mirovê ku zîmanê xwe nîzane, wek kesekî zîndankirî ye û kîlîta azadîya wî di destê dijîminê wî de ye!" Ji bo vî qonaxê li Bakurê Kurdistanê divê zîmanê Kurdî wek bîngeh bê girtin. Wek şeweyekî fermî, di hemû dezgehên de jî bo Kurd bikaribin li ser vî bîngehî avahiyek mezin û xweristî ava bikin. Xala din ew e ku xurtkirina bîngehê sazîyên huner, çand û sazîyên civaka sîvil gelekî giring e. Ji ber ku bîngehên demokratîyê her ev sazîyên civakî ne. Îro berpîrsîyariya herî mezin li ser milê rewşenbîrên Kurd e.

Nevzat Karakeçî

(Edîtorê Rojnameya Dema Nû)

Divê em vîya bizanibin ku pîrsîgîrêka Kurd pîrsîgîrêke neteweyî ye û divê li ser vî bîngehê bê çareserîkirin. Lê niha di pêvajoyê de li Tirkîyeyê tiştên ku gengeşî li ser tê kirin jî vî bîngehê dîrin û divê navê wê jî 'hewldanên çareserîkirina pîrsîgîrêka PKK'ê' be. Ez vî pêvajoyê bi erênî dinirxînim û divê her yek jî me piştîgîriya van hewldanan bike. Pîrsîgîrêka Kurd ligel aliyê wê yê çand û huner aliyên wê yê siyasî, civakî, aborî û hwd. jî hene ku hemû jî bi hev ve girêdayî ne. Ango bi avêtîna hin pêngavên derbarê çand û hunerê de ev pîrsîgîrêkî bi tevahî jî holê rabe. Lê mirov dikare bêje ku wê bibe hîmeke ewil ya rêya çareserîkirîneke mayende.

Îrfan BABAOĞLU

(Serokê Komeleya Nivîskarên Kurd li Amedê)

Di çareserîkirina pîrsîgîrêka Kurd de serbestbûna çand û hunera Kurdî cîheki îring digre. Wek despêka çareserîkirîne em karîna van çend xalan rêz bikin: Divê zarokên Kurd bi zîmanê zîkmakî werin perwerde kirin. Di televizyon û radyoyan de bi zîmanê Kurdî divê bîername were çêkirin. Nivîskar divê pirtûkên xwe bê sansûr karibin çap bikin. Di sazîyên çandî û hunerî yê dewletê de hûnermend û nivîskarên Kurd divê bikaribin hûnerê xwe saz bikin û ditînen xwe peşkeşî gel bikin. Şanoya dewletê divê deriyê xwe jî Kurdî re veke. Divê li herêma Kurdan şaredar bi rehetî bikaribin karê xwe bi zîmanê gel pêk binin.

Derwêş Ferho

(Serokê Enstîtûya Kurdî ya Brûkselê)

Bê şert, bê sinor û bê zehmetî divê Kurd mîna her neteweyekî din her mafê xwe di nava azadîyêke pir mezin de bijîn. Divê ji bona vî yekê gelek derfêtan fireh amade bibin. Dewletê gereke van derfetan amade bike. Dezgehên berpîrsîyar yê ku jî Kurdan pêk tî divê bi berpîrsîyariyê mezin rêkûrêbazîyêkî li ber xwe deynin û bi plan kar bidin meşandin. Ji bo çareseriyê gavên mezin û demdirêj ne pêwîst in. Eger mirov jî dil bixwaze îro mirov dibêje ya xwedî û sibe dest bi pêkanîna derfetan dîke. Çareserîya pîrsîgîrêka Kurd bi tî awayî nabe bi qasî serê derzîyêkê were sansûrîkirin.

Zerdeşt Haco

(Serokê Pena Kurd)

Bi ya min zîman, wêje, hûner û çanda gelê me bi giştî tenê di nav mercên xwezayî de dikarin bi pêş ve herin, xweşîya xwe bibînin. Ev mercên han jî tenê di Kurdistana serbixwe û demokratîk de dikarin peyde bibin.

Azad Zal

(Edîtorê Kovara W)

Divê em jî lîteratora derve xwe veqetînin û bi tîgînên xwe li xwe binîrin. "Pîrsîgîrêka Kurd" tîgîneke derveyî ye. Ev ne aydê Kurdan e. Ev mesele jî bo Kurdan ne pîrsîgîrêk e. Ev mesele "doz" e, "Doza Kurdan" e. Teqez divê em Kurd, bi taybetî rewşenbîr, wêjevan û ramangerên Kurd bi tu awayî "Pîrsîgîrêka Kurd" bi kar neynin. Di dewsa wê de divê "Doz" were bikaranîn. Ev bi pêvajoya asimilasyonê ve girêdayî ye. Ji bo çareseriyê divê jî vîr de dest bê pêkirin. Ji aliyê çand û hunerê ve çareserîya rojî iroyin de jî %99 di destê Kurdan de ye. Kurd îro dikarin astengî û bendên li hember wan hene rabîkin û jî aliyê çand û hunerê ve xwe biafirînin.

Piştî gundan navçe û bajar tî

Köln (Rûdaw) - Li Tirkîyeyê di salên 1940'an de bi zêdeyî li herêman ku Kurd lê dijîn, navê 28 hezar gund, navçe û bajar hat guhertin. Li ser vî yekê niha jî Niştêcîhên Kurdistana Bakur daxwaza navên bi Kurdî yê gund û navçeyên xwe dikin. Herwiha heftaya bori biryarekî diroki pêk hat û gundîkêkî li Amedê ve girêdayî navê xwe yê Kurdî wergirt. Di vî navberê de serokê Meclîsa Bajêrê Amedê Şeyhmus Bayhan jî Rûdawê re diyar kir ku ew niha li ser guhertina navên gundan mijûl in. Bayhan herwiha derbîrî ku guhertîna navan raste rast ne di destê wan de ye, jî ber ku biryara dawîn di destê Wezareta Karê Hundîr de ye. Wî herwiha bi bir anî ku ew dikarin daxwaznameyên muxtaran berhev bikin û di meclîsa bajêr de li ser guftûgoyan bikin û di vî çarçoweyê de jî walîtiya bajêr re birêkin.

Bayhan di derbarê prosedura fermî ya guhertina navê gundan ku tê meşandin de, ev agahdariya dan me: "Divê gundî bi xwe serî li meclîsa bajêr bidin. Ger biryar tunebe jî, divê li gund referandûm pêk were."

Wek tê zanin heftaya bori li Amedê Meclîsa Giştî ya Bajêrê navê gundîkê guhertî û ev biryar jî aliyê walîyeta bajêr ve jî hat pejirandin. Di derbarê paşdedayîna navê Çelkanîyê ku bi tirkî wekî "Kayapınar" hatibû guhertin jî, Bayhan wiha axifî:

"Niştêcîhên vî gundî daxwaz kirin ku jî gundê Göleçoban veqetînin û bi serê xwe bibin gundekî bi Amedê ve girêdayî. Armanç ne guhertîna navê bû. Wan serî li me dan û em jî wekî Meclîsa Bajêrê Amedê xwediyê biryarekî wiha ne: Dema gundîkek bixwaze bibe gund an jî xwe jî navçeyê biqetîne û herwiha navê xwe yê Kurdî bixwaze, em serilêdana wan qebûl dikin. Ev mînak Çelkanîyê jî wiha pêk hat."

Bayhan got ku di demêkê nêzik de li Çelkanîyê dibistanekê ava bûye û navê dibistanê ne Kayapınar lê belê wekî "Çelkanîye İlköğretimokulu" hatiye nîvîsandin. Wî anî zimên ku ev nav paşê disa hatiya guhertinê ew nîzane ku kî ev guhertin pêk aniye. Bayhan di wê baweriyê de ye ku jî niha û pêve ev gund wê bi herdu navan, angî Kayapınar- Çelkanîyê bê nasîn.

Pêşî gund, paşê navçe û bajar

Serokê Meclîsa Giştî ya Bajêrê Amedê Şeyhmus Bayhan jî Rûdawê re ragihand ku niha ew bi valahîya yasayê sîd digirin û di destê wan de biryarekî din jî heye û herwiha behsa niyeta hikûmetê jî kir: "Gundîkêkî bi navçeyê Pîrîncîkê vegirêdayî heye û dixwaze bi serê xwe bibe gund û navê xwe yê Kurdî "Softixelî" bigire. Di meha îlonê de emê wek meclîsa bajêr bicivin û biryara xwe jî wîlayetê re pêşkeş bikin. Eger ev biryar bê



qebûlîkirin, wê gavê mirov dikare bêje ku niyeta hikûmetê baş e."

Bayhan derbîrî ku dî wê yekê re ew hewl bidin ku navên hemû gundan yê bi Kurdî li wan paşê werin vegeyrandin. Di vî navberê de Bayhan destnîşan kir ku hevkarîya endamên AKP'ê yê ku di meclîsa bajêr de xwediyê 18 kursîyan in baş e û got ku di biryara Çelkanîyê de 48 dengên DTP'ê û 18 dengên wan bi giştî 66 dengên derketin e. Wî axaftina xwe ya di derbarê pêvajoyê de wiha domand: "Em pêşî jî gundan destpêdîkin. Eger di vî wari de em ser bikevin, paşê navçe û bajar jî dikarin serî li Wezareta Karê Hundîr bidin. Ji ber ku guhertîna navê navçe û bajar raste rast bi Wezareta Karê Hundîr ve girêdayî ye."

Bayhan axaftina xwe wiha qedand: "Ji xwe li herêma niştêcîhê serê sedî 90'ê wan Kurd in û ne navên tirkî yê fermî lê belê yê Kurdî yê resen bikartînin."

Îran xwedî li qurbanîyên Kurd dernakeve

Serdeşt (Rûdaw) - Bajarê Serdeşt yê Rojhilatê Kurdistanê ku li ser sinorê Başûrê Kurdistanê ye, di 28ê hezîrana 1987'an de ji aliyê Artêşa Iraqê ve hatibû kimyabarankirin. Di encamê de 132 Kurdên sivil hatibûn kuştin û bi hezaran kes bi nexweşiyên cur be cur re rûman. Qurbanîyên Kimyabarane hêji di bin bandora nebaş ya nexweşiyên ji ber kimyabarane afirine dijin.



vê hejmarê weki 8500 kesan bilêv dîke.

Serokê Komeleya Berevanikîrîna Qurbanîyên Kimyabarana Serdeşt, Salih Ezîz Pûr dibêje ku dema wan dit ku bextreşîya kimyabarane ji bira desthilatdariya Îranê û Cihanê çûye, wan pêwîstiya damezirandina vê komeleyê ditîne. Ew ji Rûdawê re wiha behsa zehmetiyên ku rû dane dîke: "Em salek û nivê tevgeriyên heta me destûra avakirina wê wergirt."

Salih Ezîz Pûr li ser armancên komeleya xwe ji van agahdariyan dide me: "Armanca me ya

yekem ew e ku digel rêzgirtina qurbanîyan, hejmara wan weki birindarên çekên kimyawî li Dezgeha Şehîd were tomarkirin û herwiha biranina salvegera kimyabarankirina bajarê Serdeşt hersal were lidarxistin."

Li gor axaftinên Salih Ezîz Pûr pêşîya damezrandina komeleyê, Dezgeha Şehîd bi tenê 94 kes wek birindarên çekên kimyewî dîke. "Em salek û nivê tevgeriyên heta me destûra avakirina wê wergirt."

Salih Ezîz Pûr li ser armancên komeleya xwe ji van agahdariyan dide me: "Armanca me ya

yên ku belge di destê wan de hene ku birindarên çekên kimyawî ne."

Ew li ser ziyarîna ku xaza kimyawî di paş xwe de hiştîye ji van agahdariyan dide: "Ev madeya kimyawî ya hatiye bikaranîn gaz a xerdelê tir e û ligel xaza arsnîk hatibû tevlihev kirin. Zanyar didin zanin ku bandora vê xazê heta 50 salan dom dîke. Ev xaz mirov lawaz dîke û sistema bergiriya laşê mirovan kêmbû. Hinek kes bi nexweşiyên kezab û roviyan dîkevin, çavê hinekan kor dibe. Hinek ji wan divê herdem çepsûlên oksîjenê bi kar binin."

Hêjayî gotinê ye ku qurbanîyên ku Dezgeha Şehîd li cem xwe tomar nekîrîne di rewşeke xerab de dijin. Ew bi xwe heqê derman û tedawiya xwe didin. Salih Pûr herwiha dibêje ku hersal 10 heta 15 kes ji ber karigeriya kimyabarane jiyana xwe wenda dîkin. Di derbarê kelemên ku dewlet li pêşîya wan diderîne ji wiha dibêje: "Me hersal çalekiyên biranînê lidar dixistin lê belê ev du sal in nahêlin. Dixwazim çalekiya biranînê di hولة biçûk de were lidarxistin û tenê yek-du peygam werin xwendin."

Parlamentêrê Kanadî Jim Karygiannis:

'Kurdistan elmasekî xam e'

Hewlêr (Rûdaw) - Endamê Partiya Liberal a Kanadayê Cim Karygiannis yekem parlamentêrê Kanadayê ye ku bi fermî serdana Kurdistanê kir û ew di nav hewldan de ye ku dostaniya di navbera herdu welatan de pêşve bibe, bi taybetî di warê aborî de.



axîfî: "Ez hatime vir ji bo ku em bizanin Kanada çawa dikare hevkarîya Kurdistanê bike. Kurdistan elmasekî xam yê yeşartî ye, ku hêji cihan nas nake. Ez dixwazim pêwendiyekî dostane di navbera Kurdistan û Kanadayê, bi taybetî di navbera Parlamena herdu aliyên de ava bikim.

Em dixwazim komeleke dostaniyê di navbera Parlamena Kurdistanê û ya Kanadayê de çêkin û tîkiliyên bazirganî yê navbera bibe cîhê giringî û baldana sereka ya siyasethanê Kanadî û wiha dom kir: "Serokê partiya me Michael Ignatieff dostekê kevin yê Kurdan e û wi di destpêka 1990'an de serdana Kurdistanê kiriyê û di derbarê Kurdan de nivîsên wî hene, lewra em gelek giringiyê didin pêwendiyên xwe bi Kurdistanê re."

Di dawiyê de peyameke Karygiannis ji ji bo welatên cînarê Kurdistanê re heye û Karygiannis wiha dibêje: "Peyama min ji bo cihanê û welatên ku Kurd têde dijin, bi taybetî Tirkîye û Îranê ew e, ku gelê Kurd dixwaze di aşîyê de ligel cînarên xwe bijî. Çawa ku siyaseta nemirovane li dijî Kurdan li Iraqê tu encamêkî dest neani, wê li tu cihekî din sût û encamêkî siyasethîki wiha tunebê."

Niha çend şirketên Kanadî wek Western Zagros, Telisman û Heritage Oil di warê derhênanana neftê de li Herêma Kurdis-

tanê kar dîkin, lê Karygiannis dibêje ewê hewl bidin, şirketên din û şandên bazirganî yê Kanadî binin Kurdistanê û Kurdistan bibe cîhê giringî û baldana sereka ya siyasethanê Kanadî û wiha dom kir: "Serokê partiya me Michael Ignatieff dostekê kevin yê Kurdan e û wi di destpêka 1990'an de serdana Kurdistanê kiriyê û di derbarê Kurdan de nivîsên wî hene, lewra em gelek giringiyê didin pêwendiyên xwe bi Kurdistanê re."

Di dawiyê de peyameke Karygiannis ji ji bo welatên cînarê Kurdistanê re heye û Karygiannis wiha dibêje: "Peyama min ji bo cihanê û welatên ku Kurd têde dijin, bi taybetî Tirkîye û Îranê ew e, ku gelê Kurd dixwaze di aşîyê de ligel cînarên xwe bijî. Çawa ku siyaseta nemirovane li dijî Kurdan li Iraqê tu encamêkî dest neani, wê li tu cihekî din sût û encamêkî siyasethîki wiha tunebê."

Xwe ne ji dêrê dihêle, ne jî ji mizgeftê


Şam (Rûdaw) - Rêjîma Sûriyeyê bixwe re ketiye pêşbirkeke dijwar. Ji aliyekî ve her tiştî dîke, ji bo ku Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê (DYA) razi bike, ji aliyê din ve jî tîkiliyên xwe bi Îranê re germtir dîke. Piştî hatin û çûna şandeya Amerîkî ya Şamê, Beşar Esed di roja çarşema 19ê tebaxê de berê xwe da Îranê û pîrozbahîya serkeftina Ehmedî Nejad ya di hilbijartinan de kir. Ew serokê Ereb yê duyem bû piştî Serokê Umanê Sultan Qabûs, ku bi vi awayê germ pîrozbahîyên xwe ji bo hilbijartina Serokatiya Îranê pêşkêş dîke. Her çendî armanca eşkere ya serdana Esed bo Îranê pîrozbahî bû, lê di şa ji mijara girtina mamosteya zimanê fransî li Isfahanê Klottilde Reiss, ku ji hêla

desthilatdariya Tehranê ve hatibû girtin, kete rojewa ve serdana bi lez. Rojnameya Fransî Le Monde bahsa wê yekê kir ku ji bo serbest berdana jina Fransî ya girtî Beşar Esed li Tehranê navbeynkari kiriyê, lê ajansên nûçeyên Îranê ev navbeynkari mandele kirin. Balkêş bû ku serdana Esed ya Tehranê ji hêla çapemeniya Sûriyeyê pir hindik hate şopandin û kêmbahsa wê hat kirin. Berevajî Sûriyeyê çapemeniya Îranê giringiyê berbiçav da ve serdana ku ji gelek aliyên ve bûbû cîhê gumanên cuda. Nexasim ku hefteya derbasbûyî, piştî berdana Nazîk Afşer ya karmenda konsolxaneyê Fransayê li Tehranê ku ew ji beşdari xwepêşandanên Îraniyan bibû û Fransayê bi awayekî fermî spasi-



yên xwe ji bo Sûriyeyê pêşkêş kiribûn. Ev rol - rola Esed di serbest berdana girtiyên Fransî yê di zindanan Îranê de - bû sedema gurbûna pîrs û gumanên

rewşenbîr û derdorên demokratîxwaz li Sûriyeyê. Van derdorên serbest berdana çalakvanên Fransî yê di zindanan Tehranê de gaweke erênî dibînin, lê di



Ger AKP pîrsa Kurd çareser neke

Li Tirkîyeyê Partiya Dad û Pêşvebirinê (AKP) niha desthilatdar e. Ev parti di warê siyasethî, aborî û demokratîzekerîna vî welatî de di diroka Tirkîyeyê ya 30 salên derbasbûyî de, partiya herî bi idîa ye. Ji ber vê yekê ve partiye piştigriyêke mezin hem ji derveyî û hem ji di nava Tirkîyeyê de stan-

diye. Gelo ger AKP pîrsa Kurd çareser neke, wê bikaribe van idîayên xwe pêk bîne?

AKP dixwaze Tirkîyeyê hem li herêmê û hem ji li Cihanê bike xwedî roleke siyasî ya ber bi çav. Siyaseteke din ya AKP'ê ew e ku dixwaze di pîrsa Erebî û Îsrailê de û herwiha di pîrsa Azerî û Ermenîyan de bibe pîra aşîyê. Ew bi vi awayê dixwaze di Cihanê de xwe weki aktorê aşîyê bide nîşandan. AKP ji bo pêvajoya tevlihbûna Yekitiya Ewropayê ji bi heman şeweyî tevdiqere lê belê ji ber pîrsa Kurd wê nekariya ti encamî bidest bixe. Lê digel evqas hewldanan jî, di AKP li herderî beramberî ve pîrsê tê: Ger tu nikarî di mala xwe de aşîyê pêk bînî, tu yê çawa ji bo welatên din bibî navbenykarê aşîyê? Ev partiya desthilatdar ji Afrikayê bigirin heta li Amerîkaya Latin û Asyaya Dûr li çavkaniyên Aborî yê nû digere. Lê dijberî ve yekê zeminên aborî yê li Bakurê Kurdistanê ku ji sişeyan yekê bîngeha aborîya Tirkîyeyê pêk tîne, ji hêla dewletê ve nayê bikaranîn.

Serwetên sererd û bînerdên vî welatî bi rengên herî xerab tene bikaranîn. Ji ber rewşa siyasî hêji riyên herî paşdemayî tene bikaranîn. Ji ber vê nakokiyê divê ji berpîrsên AKP'ê were pîrsîn; Ger di welatê we de derfetên heyî neyên bikaranîn û ev dewlemendî ji nedîtî ve werin, hûnê li Amerîka û Afrikayê bikaribin çî bidest bixin?

Herkesê piçekî ji rewşa Tirkîyeyê ya dadwari û demokrasiyê agahdar be, dizane ku pîrsa Kurd neyê çareser kirin, ev herdu tîgeh bêbingeh dimin. Ji ber ku hejmara Kurdan ji zêdeyî sedî 30'yên şîniyên Tirkîyeyê pêk tî û ev girseya mezin ya Kurd ji mafên xwe yê siyasî û civakî bêpar in.

Derveyî van hemuyan, Tirkîye di warê moral û rûmetên mirovî de di rewşeke gelekî xerab de ye. Ji damezirandina Komara Tirkîyeyê ve ev pîrsîrêk di rojevê de ne lê belê bi taybetî ji şerê 30 salan û vir ve ew pîrsîrêk çend qet bûne.

Dema iro em li rojewa germ ya li Tirkîyeyê dinêrin, partiya desthilatdar AKP taqîkirîneke diroki dide. Ji xwe ger ew ve pîrsê çareser neke, rewşa Tirkîyeyê wê hêji xerabtir bibe. Ger ev partiya bi idîayên mezin tevdiqere ve pîrsîrêka bîngehin ya Tirkîyeyê çareser neke, wê ev gotinê wê hemû bibin bilqên li ser avê. Ji ber tengezariya li hember ve pîrsê di si-çil salên dawî yê desthilata Tirkîyeyê de gelek parti hatin û çûn. Beyî çareserîyêke demokratîk ya pîrsa Kurd, AKP ji wê tevli kerwanên van partiyên tîkçûyî bibe.

Ji bo wezîrtiyê 3 jin hatin pêşniyarkirin

Tehran (Rûdaw) - Cara yekem di diroka desthilatdariya Komara Îslamî ya Îranê de 3 jin ji bo postên wezîrtiyê hatin pêşniyarkirin. Serokomarê Îranê Mehmed Ehmedinejad ji bo kabîneya xwe ya nû, ku wê ji 19 wezîran pêk bê, 3 wezîrên jin pêşniyar kirin: Fatme Acirlo ji bo Wezareta Rîfahê, Merziye Wehid Destcêrdî ji bo Wezareta Tendurustî û Derman û Sosên Kîşawerz ji ji bo Wezareta Çandîniyê hatine pêşniyarkirin.

Di kampanya hilbijartinên de pîrsa beşdariya jinan di biryardan û rêvebirina welat de mijarekî germ ya kampanya berbijêran bû. Hemû berbijêran di propaganda û bernamêyên xwe de digotin, ger ew serbikewin, ewê çend jinan bikin wezîr. Herî zêde Mûsewî û Kerûbî ew soz didan.

Ev pêngava Ehmedinejad buye cîhê nerazîbûneke berfireh di nav baskê tundajo yê Komara Îslamî a Îranê de û bi taybet meleyên bajarê Qumê pir jî ve gavê acîz in û rexneyan ji Ehmedinejad digrin. Di Komara Îslamî a Îranê de, mafê jinan yê wê yekê tune ku bibin serokomar, wezîr, dozger û hin berpîrsyariyên din yê hîkûmetî.

heman demê de dipîrsin: Gelo wê ki rolekê di serbest berdana çalakvanên demokrat û mafparêz yê di zindanan Sûriyeyê de bilize?

Di nivîseke xwe de Eli Elseraf ve pîrsê dîke: Gelo ji bo serbest berdana Fayîz Sara wê ki navbeynkariyê bike? Fayîz Sara nivîskar, lîkolîner û rojnamevanekî Sûriyeyê ye. Ew di 3ê çîleya 2008'an de hat girtin û heta niha carekê hatiye dadgehê. Ew ji bi tawanbariya „qelskirina hestên neteweyî yê ummetê“ hatiye girtin. Elseraf wisa nivîsa xwe bi dawî dîke: "Wezîrê Karê Derve yê Fransayê Bernard Kouchner li ser zindana ku Reissa ya 24 salî têde bû dibêje ku ew di zindaneke pir xerab de hatibû girtin û ewê bi kafeletê bê berdanan û wê li

sefaretaya wan ya Tehranê bê rawestandin, hetani ku doza di dadgehê de bi dawî bibe. Lê wê rewşa girtiyên zindana „Edra“ ya ku wezîr Kouchner tiştêkî li ser wê nîzane wê her weha - beyî ku kes navbeynkariyê bike - berdewam bike."

Ji aliyê xwe ve rêjîma Îranê jî bi pejirandina navbeynkariyê û bi erêkirina daxwazên Esed hewl dide, cîhê hevvalbendê xwe li cem eniya li hember xwe - Emerîka û Ewropayê - xurtir bike. Ji ber vê yekê bi kêfxweşî ev navbeynkariyê biserdikeve. Rêjîma Sûriyeyê jî hîsê Amerîkayê ye û sernermiya xwe didomîne û hem jî, her ku tî xwestin, berê xwe dide mizgefta meleyan li Îranê.

Xelil Xemgîn:

'Gelek caran ji meşhûrbûnê aciz dibim'

Evdila Koçer
Bonn (Rûdaw) - Dema behsa Xelil Xemgîn tê kirin heman tiştê bira herkesî: Ew sembola serdemekê ya mûzîka kurdi ye. Stranên wî yên şoreşgerî di salên 90'î de ji civakê re dibû nan û av. Nîfşek bi stranên wî re mezîn bû û têkoşîna kurdi nas kir. Me bi Xemgîn re li ser jîyan, huner û xewlên wî xeyalên wî axifin:

Xelil Xemgîn yekî çawa ye?
 Hinekî dîmîti li cem min ji heye, lê dudilî kê m e, ez hewl didim ku ji Lorin û Narinê re baveki ne wek bavê xwe bim...

Strana ku te pêşî striya kîjan bû, tê bira te hêj gelo?

Strana pêşî ku min straye, bi gumana min, "hey berde berde"... ji dengê Hesên Cizirî ye, lêbelê strana pêşî ku min bi xwe çekirî bû û strabû, "Serbra dila" ye.

Eger mirov behsa hostayên te yên deng û mûzîkê bike, tu yê behsa kê ji me re bikî?

Di zarokatiya xwe de, min ji dengê bapirê xwe gelekî hez dikir, her weha bavê min ji, wisa huner hez û xwedî dengê xweş bû, lê di wê demê de, radyo serreke bû, dengê Hesên Cizirî, M. Arîf, Kawîs Axî û Piştî re ji, Mihemed Şêxo û Tahsîn û hwd, ew hosteyên min ên serreke bûn. Di ciwantiya xwe de, her weha di destpêkirina xebata hunerî de, ez bi mirovekî evindar ku ew bû şehîdê evîna xwe, gelekî tesîr bûm! Ji xwe mirovekî hunermend ne bû, lê serpêhatiya wî û drama ya ku wî di evîna de jiya, ji berî jîyana xwe ji dest bide, serpêhatî û çiroka xwe tevayî bi stran dihanî ziman, mirovekî xizan û bêkes bû...

Dema tu li paş ve dinêrî, Koma Berxwedan ji bo te çi îfade dike?

Koma Berxwedan, ji bo min dibistana hunera netewî, eyneya hunera gel ku bi xwe afirandiyê



ye, cihê xudana eniya kedkar û qedrê fedekariyê ye! Tevî ku bi salan min barê berpirsiyari ya vê komê girtibû ser milên xwe jî, ez hin jî, xwe weke şagirtê dibistana K. Berxwedan dibînim, ilhama xwe ji wê fikir û heycana wê distînim. Ji hunera mûzîkê bêhtir, fikir, şêwaz, xêz û xal û felsefa ku K. Berxwedan li ser hati afirandin pêwîst e. Li gor ditîna min, hin ev felsefê û bandora wê nehati nirxandin! Rast e, gelek kes û derdoran behsa K. Berxwedan kirin, hinek rexne, hinek weki din, lê heya niha ti kesî nekariye, di warê felsefî, sosyoloji û pîskolojî de, qonaxên bandora K. Berxwedan li ser civakê kiri, bikaribe bine ziman, mixabin, hin kesan, bi navê rewşenbiri û niviskariyê rabû, rexne û şiroveyên xwe, tenê bi nêrîna siyasî kirin!

Niha gelek stranbêj hene her çiqas ku stranên politîk û siyasî jî distrên lê xwe weki kesên apolîtîk nîşanî civak û medyayê dikin?

Bi ditîna min, civata bê politîk

civata mirî ye! Politîka weke dîreksonê trembêla jiyana civaka ye, di diroka civakan de civakên ku terka hedefa xwe kirine an wenda bûne, an ji bi êş û azarên giran re rûbe rû mane! Rast e, siyaset karê siyasetmedara ye, lê belê têkildari û eleqederbûna mirov û civakê bi polîtîkayê re, pîvana sewiya wê civakê ye! Ez ne bawer im ku civakê mina civaka me ji politikayê reviya be.

Bi giştî divê rol û peywira stranbêjan çi be?

Di derbarê rola stranbêjê, an hunermendê, min berê jî, gelekî nivisandiyê. Berî her tiştî, pêwîste armanca ku stranbêjan hunermend ji bo hewldide, zelal be, "... ez stran dibêjim, muzîk çêdikim, an şewekar im, helbestvan im, şanoger im... hwd, gelo, ez vî kari jî bo çî armancê dikim?" Eger armanc "hunera gel, ji bo gel e" pêwîst e mirov bi armanca vê yekê re û pîvana civakê re, dirust û bi wêfa tev bigere. Na, eger armanc, "huner ji bo huner û berjewendîya kesayetê ye, êdî tişteki merev ji wire

bêje nîne! Hunermend û rewşenbîrên ku ji zîkê vevê civakê derdikevin, pêwîste rewşa civaka xwe, bi her awayekî binirxînin!

Gelek caran tê rexnekirin ku stranbêj li ser sehnê bi kurdi distre, lê bi heyranên xwe re jî bi tirkî sohbet dike...

Kemasiyêke din jî, ya ên min min û te ye, ber ku dema em rexneyên wan bi zimanê kurdi dikin, em xwe jî birdikin ku heyran, haya wan hunermenda ji çapemeniya bi zimanê kurdi tuneye. Malxirabûna herî diwar ew e ku li nik bandora asimilasyonê, mirov bi ber pêlên populîzm û diranên çerxa globalîzma hov keve ye!

Gelek stranbêjên Kurd gehê xwe nadin wêjeya Kurd. Tu vê yekê çawa dinirxîni?

Li cihanê kiriterîyên rewşenbiri û hunermendîyê, heya radeyekê xuya û eşkere! Lê di civaka me de, ez guman dikim, ev pîvan û asta nirxandin û bi navkirina kesayetî, nehatiye zelal kirin. Herkes dikare navê xwe bike hozan, hunermend, dengbêj, helbestvan û nivîskar. Di encamê de, bi qasî artêsekê niha hunermend û stranbêj çêbûne. Ji bo herkesî nabêjim, lê pirani, hin jî, xwe bi pêlên asimilasyonê ve berdaye, di cihana xeyalên gelekî biçûk de, bê berpirsiyar dijin! Ilhama hunermendê, pêwîste bi hestên resen ên nirxên civaka xwe bin.

Nivîskarekî ku tesîrê li ser mûzîka te kirîye heye?

Mîna di salên ciwaniyê de, kilasîkên me yên netewî, gelekî xwendîne. Dibe ku tecrûbê û xezîna min ya herî min li ser lîngan zindî dihele, ev be! Mîna ji gelek nivîskaran bandor girtiye. Her yek ji wan mîna rengê gulek cuda ye. Her wîha, her yekî bandorek bi şewazekî li min û xebatên min kirîye.

Te herî zêde tekstên kîjan nivîskaran ji bo mûzîka xwe bi kar anîye?

Ez dibêjim qey herî zêde, an ên min bi xwe ne, an jî, ên

Hekim Sefkan in. Lê herî bêhtir, min gotin û helbestên Hekim, seydayê Cegerxwîn, xwendîne.

Gelo tu dengê xwe çawa diparêzi, ji bo vê yekê dermanek an jî formûleke te heye?

Ti formûlên min tune ne! Formûla herî bi tesîr, moral û heycana gel û civaka mine!

Rojeke te çawa derbas dibe?

Weke bavekî berpirsiyar, bêguman, pilansaziya min rojane heye, bi giranî, giringiyê didim mijûlbûna herdu zarokên xwe, her weha, şopandina rojev û xwendin, hinekî ji liv û spor, êvaran ji bo xebatên xwe ên hunerî vediqetînim...

Tu li weşana TRT 6'ê çawa dinêrî. Ku bixwazîn bi te re hevpeyvînekê çêkin tu yê ji wan re çi bibêji?

Vekirina vî kanalê li her halekî, ji xwe û berê nehatî avakirin, ev bêxwudiya, çîma 80 sal e wisa di inkarê û imhayê de îsrar kir de, û iro jî ji bo kîlê çavê Kurdan herhal nehatî vekirin! Yanê ev kanal ne bi dilê dewletê, ne ji bi dilê Kurdan hate damezîrandin! Welhasil ger daxweziyê wisa bibê, xweş xeber e, lê min ne bawer e! Pergala rastîya gelê Kurd nepejirîne, 666 TRT an veke jî, wê çi biguheze?

Dengbêj û stranbêjên ku di dilê te de gelekî şêrin in kîjan in gelo?

Nayên hejmartin! Naxwazim ên koç kirine dubare bêjim, lê belê, ên zindî, gelek in! Ji bo min, kapasîte û aso ya fireh, teybetmendiyên pîrkê pêwîst e! Hest û xêzan pêşbera hunermend girîng e!

Tê gotin ku stranbêj qet ji hev hez nakin, ji hev dihesidîn. Çîma gelo?

Kesên serwest û dilsozên civata xwe, pêwîste bi mijarên ku mirovan li paş dihelîn, meseleyên biçûk re mijûl nebin...

Dezavantajên meşhûrbûnê çi ne li gorî te?

Yên ku xebata min û helwesta min şopandine, baş dizanin, di meşa min de, şuhret her demê,

di dereca duyemîn de maye, yekemîn ji bo min, her demê mirovatiye. Bê guman tengezariyên şuhretê hene, dezavantajên xwe gelek in, lê gava ku mirov her tiştî, bi armanca xizmeta civak û mirovahiya xwe bispêre ser milê xwe, pîrsgirêka ku çareser nebe nîne.

Tu ti carî ji meşhûrbûna xwe aciz bûyî?

Gelek caran aciz dibim.

Plan û projeyên te yên heta salekê çi ne?

Bila ew surprîz bin.

Niha ji em werin ser du sê pîrsên sivîk. Xeyala te ya herî mezin çi ye?

Xeyalên min gelek in, lê ya herî mezin, yekîtiya Kurdan û azadiya gelê me li sê beşên azad û azadiya Rêberê gelê Kurd, rêzdar Öcalan e.

Ji nav stranbêjên Tirk û Ereban, tu ji kê hez dikî?

Huner ji bo civakan, mîna bax û gulistanê ye, her civakê, bax û gulistanê xwe hene, li Rohîlata Navîn, rengên mirov, tehma xwerinan, bedewtiya gul û gulistanan wek hevdu ne! Ji Tirkan, ez li gelekî guhdar dikim, ên kevn û yên nû. Kazîm Koyuncuyê Laz, ji bo min pîr cuda bû! Lê mixabin zû alîjîyan bû.

Di nava Ereban de jî, dibistana Rehebaniya heye, Feyruza Lubnani, deng û rengê pîr cuda û bi bandor e!

Felsefa te ya jîyanê çi ye?

Bi xwe re dirîst bîji, wek tu bawer dikî, dibêji, idia dikî, wisa bîji! Mirov nesneyek e, hin dibe, dide hinkirin, pêwîst e mirov bi xwe û rengê xwe, li ser koka xwe hemdem bibê! Her tişt bi kedê tê afirandin!

Berî ku te koçî dinyaya din bikira, sê tiştên ku te dixwest di jîyana te de pêk bihatana çi bûn?

1- Dawî li xeribiyê bihata. 2- Di muzîka kurdi de, min bikarîba muzîk û şanokarî digel hevdu biafirand! 3- Ger derfêten min ên maddî hebûna sazî/dezgehêkî, ji bo xizmeta azadiya jînê, min ava bikira!

Munzur Çem:

"Milet ke Wayîr Nêvejîya Ziwan mireno"

Îsmet Siwerekî
Rûdaw (Berlin) - Munzur Çem, noştox û kirmanckî (Zazakî) ser o xeylê xebatê xo estê. 1977 ra nat, no derheq de xebat kenê. O, wareyê kirmanckî de kesê ke sey yew otorite ênê qebulkerdene ra yew o. Grûba Xebata ya Vateyî ya ke standartdîze biyayîşê kirmanckî ser o xebate kena, û Institutê Ziwan û Kulturê Kirmanckî (Zazakî)-Berlînî de qandê reyayîşê lehçeya kirmanckî kar û bari miyan de yo û vano ki: "Milet ke Wayîr Nêvejîya Ziwan mireno"

Şîma, lehçeyê zazakî ser o gurîyenê û heta ewro xeylê kitabî neşir kerdê. Hûmareyê kesê ki zazakî qisey kenê çend o?

Îstatistik çîn ê, no semed ra ki hûmare ser o qeseykerdîş zor o. Goreyê qenaatê mi, Kürdistan û Tirkîyê di nezdiyê 4 milyoni Kurd ê ke Zazakî qesey kenê estê. Welatanê binan de, ma vajime Ewropa de ki bi des hezaran Kirmanckî (Zazakî) ciwiyîne.

Çîçî ra dimilkî hende peyser mendo?

Bifikire! Kirdasî taw o ke sinorî derbaz kenê, şonê parçeyêde Kürdistanî yo bin, uca lehçeya xo vînen, bi aye qesey kenê, bi aye karê xo ramenê. La-

belê ê kirmancan şansêde xo yo winasî çîn o. Bi serran, bi kirdaskî radyoyî bi, labelê bir kirmanckî (zazakî) çîn bi. Cayê ke kirmanckî (zazakî) te der ciwîyîne, nê cayan de zaf zoverdayîşê girsî peyda biyê. No ki biyo sebebê rijnayîşê û xiravkerdîşê de xedari. Kirmanckî (zazakî) zaf amê nefikerdene. Heto bin ra sey kurmancan ya ki kirdasan, edebiyatê kirmanckî yo klasik nêamo nuştene. Nimûne, Feqiyê Teyran, Melayê Cezîrî û Ehemêdê Xanî yê lehçeya ma çîn ê. Anciya têsîrê medereseyan ki no derheq de faktorêde zaf giring o. Ma vajime ke kirdasan medereseyan de bi kirdaskî wendo. Bi ey qesey kerdo, bi ey nušto. Kirmanckî (zazakî) wayîrê imkanêde winasî nêbiyê. Nê pêro sebebê asimilasyonî yê. Nê şertan de şarê ma zîwanê xo ra duri kewto.

Şîma, qandê reyayîşê lehçeya kirmanckî xeylê karî miyand de ca genê. Şîma şenê nê xebatanê xo ser o ma rê hebê informasyon bidê?

Ez bi xo, di sera 1977ine ra bi nat kirdiki ser o xebetina. Zaf ya ki şenik, nê kari ramena. Mi heta ewro, ciya-ciya kovar û rojnayemeyan de xeylê meqaleyî bi kir-

manckî neşir kerdê. Kirmanckî-Tirkî ferhengê mi esto. Ferheng, mi 1994ine de Swêd de amade kerd labelê ewro qediyoy, piyasa de çîn o. No miyan de mi se ra vêşêrî lawikê hetê Dêrsimî day arê û sey kitabî çap kerdî. Nameyê nê kitabî "Tayê Kilamê Dêrsimî" bi. Aye ra dime lawikê neweyî mi dayî arê û peyniyê de ki kan û neweyî rasnayî pê û newe ra çap kerdî. Kitabo newe hetê "Weşanên Dengî" ra İstanbul de ame çapkerdene û nameyê xo ki "Hewara Dêrsimî" ya. No kitab de, meseleyê ke biyê sebebê vatişê nê lawikan, mi inan ra ki xeylê teneyî tesbît kerdê û nuştê. Yanê merdim no kitab de tena lawikan bi xo nê, sebebê peydabiyayîşê inan ki vînen. Têpiya, tayê ropotajê ke mi qirkerdîşê 38î ser o kerdîbi, ê ki mi sifte bi kirmanckî, o ra dime ki bi tirkî dayî çapkerdene: nameyê nê kitabî "Kulê 38"î yo. Kitabêde mi ki nameyê ci "Luye Be Biza Kole ra" yo. No kitab de mi tayê şanikê miyanê şarî de arê û çap kerdê. Mi qismêdê hikayanê xo ki ancîya sey kitabî de çapkerdene. Nameyê nê kitabî "Hewnê Newroze" yo. Kitab, 2005ine de hetê Weşanxaneyê Vateyî ra, İstanbul de ame çapkerdene. Kitabêde mi, derheqa



gramerê kirmanckî der o. No kitab, bi izahê tirkî yo, 2003ine de bi destê Deng Yayinlari İstanbul de amo çapkerdene. Kitabê min o peyên o ke mi bi kirmanckî nušto "Gula Çemê Pêrre" ya. Kitab roman o û 2007ine de hetê Weşanxaneyê Vateyî çap kerd.

Tayê kesê zazakî estê ke vanê; "zazakî lehçeyê kurdi niyo" û alfabe ya ke şîma gurenênê qebul nêkenê.

Gruba ma na iddia rast nêvînen. Na idia ne hetê zîwanî ra rast a, ne ki hetê tarîxî ra. Şaro ke kirmanckî qesey kenê, hezar serrê ra vêşêrî yo ke xo kurd vînen, xo ra "kurd", vînen. Miletê ma, zîwanê xo de xo ra "Kirmanck", Kirdî, "Dimilî", "Zaza" ya ki "kurmanck" vano labelê zîwanê binan de ke qal kerd vano "kurd". No ki êno o mane ke nê nameyî pêro mana "kurd"î der ê. Tarixê

ma de niyadê, heta 1980, cayê yew kirmancî ya ki zazakî nêvato ke "ez kurd niya" ya ki "ma kurd nime", "zîwanê mi kurdki niyo. Labelê 1980yî ra dime noca-haca tayê peyda bi, yek de "keş" kerd ke "zazakî kurd niye!" Baş o, çî vuriyabi, se bibi ke mîlêto ke her tim xo kurd diyo û kurd nas kerdo, yek de bibi mîlêto de bin? Bêguman hetê ilim û tarîxî ra qet çiyê nêvuriyabi. Vuriyayîş, rew Kürdistan û Tirkîya bi, politikaya dewlete biye. Ma gani xo viri ra mekeme ke, herkesî ra ravêr dewlete no fikir ard werte. Heto bin ra şert û surtanê a roje ki seba iddiyanê niyanênan, zeminêde baş peyda kerdîbi. Zulim, sernêkewtişê herketê sosyalistî û Kurdan, xiravbiyayîşê psikolojiyê sosyalî, bêbawerî û bêumudiye ûeb.

Enstitûtê Berlînî, kamcîn xebate kerda û keno?

Înstitûtê Zazakî yê Berlînî serda 2001 di saz bi. Armancê xo derheqa zîwan, tarîx û kulturê kirmancan de bi metodê ilmi karkerdîş bi. Ma vajime arşiv, konferansî, cigerrayîşî, kitabî, xebata zîwanî ûhw. Heta ewro ma hem derheqa zîwanî de, hem ki derheqa tayê meseleyanê dirokî de tayê konferansê başî amade kerdê. Ma seba wendiş û nuştîşê kirmanckî ki xeylê kar kerd û tayê kursê başî amade kerdî. Ma 2 serrî na ra avê, tarixê ma de raya virêne, seba yadkerdîşê Sey Rizayî şewê amade kerde. Labelê tayê hetan ra tanga Institutî

esta. Karo ke heta ewro ma kerdo, sey vatena ma niyo. Şarê ma tena zîwanê xo rê nê, dezgehanê sey "Institutî" rê ki wayîr nêvejîno.

Hukmatê Kürdistanî zîwandê zazakî û lehçeyê binan ser o çî fikirîyeno?

Pêşniyazê na konferansa ma, Grûba Xebate ya Vateyî kerd, Wezarete Kulturî yê Kürdistanî ki no pêşniyaz ca de di, "ya" vat. Barê finansamanî vileyê wezaretî de bi. Ma wast ke di grûbê Kurdan, Kürdê ke kirmanckî û hewramkî qesey kenê, bêrê têkiştê; tena hetê zîwanî ra nê, hetê tarîxî û kulturî ra ki yewbin bişînasnê, bidê-bigêrê; bibê wayîrê haydariyêde başe. Çi ke xeylê zîwan û tarîxnasî, nê her di grûban yewbin ra zaf nêzdî vînenê. Konferansêde winasî raya virêne biye ke ame kerdene. Ni riwal ra ki tayê kemiyê xo bi labelê gamêda serkewtiye biye. Ewro, derheqa zîwanî de ede Başurê Kürdistanî de, hina politikaya zîwanî her het ra kifşê nêbiya, ronêniştî. Tawo ke hukmat her het ra wayîrê politikayêde tenê nêbi, nêskino tayê gaman berzone. Ez hêvî kena na perse demêde kilmek de, bi şêklêde demokratik hal bena. Kurdi gani ferq mekerê miyanê lehçeyanê zîwanê xo. Kesê ke lehçeyan qesey kenê, her het ra wayîrê aynî heqan bêne. No derheq de ez pê sistemê Swisre zaf qayil bena. No sistem seba ma, nimûneyêde zaf baş o.

Bendava Ilisuyê:

'Armancên bendavê siyasî ne'

(Ji Rûpela 1)

Holmz di derbarê mebesta serdana xwe ya ji bo Herêma Kurdistanê jî Rûdawê re wiha axifî: "Ez hatime hinek agahiyên di derbarê nerîna xelkê, sazî û dezgehên Herêma Kurdistanê ya li ser Bendava Ilisuyê bidim hev. Herwiha xelkê heremê agahdar bikim ku dirûstkirina bendava navborî wê çiqasî bandoreke negatîf li ser jiyana wan bike."

Holmz par serdana bajarê Heskifê kiriye û dibêje ku wî wek çalakvanekî mafên mirovan xwestîye jî nêzik ve wan mirovan ku bi sedema dirûstkirina Bendava Ilisuyê derbider dibin bibinin.

Bankeyên Ewropî peyman betal kirin

Hikûmeta Tirkiyeyê dixwast bi hevkarîya çend kompanî û bi alîkariya diravî ya ji çend bankeyên Ewropî, Bendava Ilisuyê dirûst bike. Lê ji ber Tirkiyeyê şertên xwe pêknanîn, meha borî bankeyên Ewropî ji biryara xwe ya ku diviyabû 630 milyon dolara wek qerzê bidin, betal kirin.

Ji xwe ev bi salan bû ku li Tirkiyeyê û li Ewropa kampanyayên bi hêz li dijî dirûstkirina

Bendava Ilisuyê birêve diçûn. Popstarê Tirkê bi navê Deng Tarkan yek ji beşdarên kampanyayê ye. Di hevpeyiveke berê ya bi Rûdawê re, Tarkan gotibû ku "jiholêrakirina şunwarê Heskifê karê şeytên e."

Aypak Taşlı ya ku bi Holmz re hatiye Başûrê Kurdistanê, berpirsa heman kampanyaya li Batmana li Bakurê Kurdistanê ye. Ew destnîşan dike ku par ji ber ku çuyê wêneyên xelkên gundê Germava, ku dikeve ber bendavê, girtîne û raporek li ser danîştvanên gundê navborî amade kiriye, ew şevêki aliyê Artêşa Tirkiyeyê ve hatiye girtin û kamera wê jê hatiye standin.

Taşlı radigihîne ku dirûstkirina bendavê dibe sedema ziyaneke berfireh ya mezin ya xelkên navçeyê. Her wiha nêzikî 75 hezar kesan ji cih û warên wan derbider dike. Ji bili ve yekê şunwarê diroki û warên geştûguzari jî wê di bin bendavê de bimînin.

Siyaseta bi riya avê

Wenekêşê Fransî An Holmz diyar dike ku ziyaneke dirûstkirina Bendava Ilisuyê ne bi tenê digihîn Bakurê Kurdistanê, lê zîyana wê Iraq û Herêma Kurdistanê jî dide ber xwe. Ew wisa pê

de diçe: "Peyama min ji bo xelkê Herêma Kurdistanê ew e, ku bila dengê nerazîbûnê li dijî dirûstkirina bendava navborî hildin û xwepeşandanan lidarbixin. Bila Hikûmeta Bexda têxin bin zextan, ji bo ew ji zextan li ser Tirkiyeyê bike. Ji ber Bendava Ilisuyê wê bibe sedema kêmbûna avê û wê bandora ne baş li ser jiyana xelkê heremê jî bike."

Taşlı jî tine ziman ku armancên siyasî li pişt dirûstkirina Bendava Ilisuyê hene û Tirkiyeyê dixwaze bi vî awayî hatina avê ya li ser Iraqê kêmbike û wê yekê weki qerteke siyasî bikarbîne.

Ew nerîna xwe ya li ser mebestên siyasî yên Ilisuyê wisa diqedîne: "Wezirê Av û Enerjiyê yê Tirkiyeyê Weysel Eroğlu berî demêkê bi eşkereyî ji bo rojnâmeya Radikal a tirkî ragihand, ku mebesta wan ji avakirina Bendava Ilisuyê hiştina navçeyê ya di nav avê de ye, ji ber ku çekdarên PKK'ê xwe li wir vedîşêrin."

Holmz û Taşlı daxwazîna hevdiştinê bi Hikûmeta Herêma Kurdistanê, sazîyên sivil û sazîyên medyayê yên Herêma Kurdistanê bikin, ji bo ku ew jî li dijî avakirina Bendava Ilisuyê rawestînin û kampanyayekî birêve bibin.

Profesora Amerîkî:

'Erkê Hikûmeta Kurdistanê reform in'

(Ji Rûpela 1)

We proseya hilbijartinên Herêma Kurdistanê çawa dît?

Ji demeke durr û dirêj ez çavdêriya pêşketinên Kurdîstana Iraqê dikim. Li gor min hilbijartinên Herêma Kurdistanê bi awayekî serkeftî birêveçûn.

Dengên Lîsta Goran we ecêbmayî hişt?

Piştî serdana min a dawîn ya Herêma Kurdistanê di meha gulana borî de, ji dengên ku Lîsta Goran bidestxistin ecêbmayî nemam. Rêjeya dengên Goran nêzikî ya ku çavdêrên Kurd (Bi taybetî YNK û PDK'ê) jî min re gotibûn, bûn.

Gelo Lîsta Goran dikare reforman di sistema siyasî ya Kurdistanê de pêk bîne?

Bi bawerîya min reformxwaz li Herêma Kurdistanê pir in û di nav hemû hêzan de hene, bi hevî me ku ew serbikêvin. Em hemû dizanin pîrsgirêk û hevrikîyên Herêma Kurdistanê çine. Li gor min, divê gendeli û xizperestî jî holê bî rakirin. Stûbarîya herî girîng a Hikûmeta Herêma Kurdistanê reformekirina rêberî, serkirdayeti û tevahiya sazî û dezgehên heremê ye. Em wek dostên jî derveyî heremê divê alîkariya çaksazî û moderîzîkirina pêkhata bîngehîna Hikûmeta Herêma Kurdistanê bikin. Herwiha divê kultûreke vekirî bî dirûstkirin û zaniyarî di navbera wezaretan de bî şewazeke nûjen bî guhastin. Disa peywendiyên wezaretan û rêberîrên giştî divê bîna bîhêzkirin. Bi bawerîya min pêwîst e wezîr bi xwe rêberîrên giştî destnîşan bikin, bi mebesta damezrandina rêberîrêyê çalak û pêşkeftî di her wezaretekê de. Bê guman serkirdayetiya Hikûmeta Herêma Kurdistanê û hevweletiyên Kurd dikarin guherînan bicih

bînin û çaksaziyên erênî û sistemeke modêrtirin biafirînin.

Bi bawerîya hinek kesan dibe ku li ser postê serokê hikûmeta dahatû ya Kurdistanê wê di navbera PDK û YNK'ê de pîrsgirêk derkevin. Hun çî dibêjin?

Bawer dikim serkirdayetiya PDK û YNK'ê dikare bi riya aştiyane pîrsgirêkên xwe çareser bikin û lihevhatîne peyde bikin. Her di pêşerojê de jî wê wiha be.

Di vê dema dawîn de girîjî û nakokiyê mezin di navbera serkirdayetiya Kurd û Hikûmeta Nûrî Malîkî de peyde bûye. Li gor we, herdû alî dikarin nakokiyên xwe çareser bikin?

Ger niyeteke paqij û şefaf li cem herdû alyan çêbibe û nîmaza Amerîka di vê meseleyê de beşdar bibe, geşbînî me ku Hikûmeta Herêma Kurdistanê û Serokwezîrê Iraqê Nûrî Malîkî pîrsgirêkên xwe yê hestiyar, nîmaza pîrsgirêkê petrol û navçeyên cihê nakokiyê li gor destûra Iraqê çareser bikin.

Li gor we dibe ku nakokiyên navbera Hikûmeta Navendî û Hikûmeta Herêma Kurdistanê li ser navçeyên cihê nakokiyê bibin sedemê derketina şerê navxwe?

Na. Bê guman niyeta aliyên Kurd û Ereb baş e. Ji mîj ve li Iraqê xwîn tê rijandin, hemû netewên Iraqê qurbani dane û nabe tu neteweyê hest bike ew bi tenê di dema 30 salên borî de hatiye bînpêkirin û ketiye ber xezeb û çavsoyî. Bi bawerîya min, ji bili îdeolojiyên siyasî, serkirdên girîng ên Iraqê mesele fahm kirine ku di encama kiryarên Amerîka de Iraq jî destê diktatoriyê hatiye azadkirin.

Bawer nakim tu serkirdêki Iraqê bihaya azadkirina welatê xwe nas neke. Karê herî girîng e serkirdên Iraqê ku plûralîzmê berbelav bikin û desthelatdariyê dabêş bikin û baş fahmbikin ku dabêşkirina desthelatîyê di navbera Hikûmeta Navendî û beşên din Iraqê qels û lawaz nake, berevayî wê dabêşkirina desthilatê bibe alîkar di warê pêşxistinê Iraqê û avakirina Iraqêke modêrn û pêşkeftî. Iraqêke bi xwe û cînarên xwe re aştiyane.

Hun rola Washingtonê di çareserîna wê nakokiyê de çawa dinirxînin?

Divê Washington di nav vê meseleyê de bîmîne û bi awayekî aktîv û çalak eşkere û li pişt perdeyê kar bo herdû alyan bike û piştvanîya encameke erênî bo hemû alyan bike.

Hestekî wiha li gel xelkê û serkirdayetiya Kurdistanê peyde bûye ku Îdara Obama zêde girîngiyê dide Hikûmeta Malîkî û bi tenê dema ku pêwîstiya wê bi Kurdan çêdibe berê xwe dide wan. Bi bawerîya wê ev rast e?

Îdara Obama kareki baş dike û piştvanîya Iraqêke demokratîk, plûral û federe wek di destûra Iraqê dike. Îdara Obama timeke çalak li Iraqê daniye jî bo nêzikkirina hemû pêkhatayan. Herwiha, idara Obama aliyekî ser yê din negirtiye. Ev piştvanîya pêşdabirina demokratîyê li Iraqêke federe yekgirtî dike.

Gelo Îdara Obama di çareserîna meseleya Kerkûkê de ciddî ye?

Îdara Obama di çareserîna meseleya Kerkûkê de pir ciddî ye, lê belê bi tenê serkirdên Iraqê dikarin lihevhatîne dijwar ên pêwîst bo çareserîna pîrsgirêka Kerkûkê hêfsan bikin.

Serokê nû yê Kongra Gel Remzi Kartal:

'Çareserîya aştiyane ne karekî hêsan e'

(Ji Rûpela 1)

Kartal, di derbarê çareserîna Pîrsa Kurd a bi modelekî nû jî axifî. Kartal got ku ew daxwaza dewleteke klasîk di berjewendiyê Kurdan de nabînin, ji ber ku çareserîyekî wiha dibê bibe sedema çêbûna şerê mezî. "Hem dewletên dagirker ên Kurdistanê û hem dewletên mezî dîxwazînan li ser pîrsgirêkên me bazîrganî û siyaseta bîkin. Ya ku em behsa wê dikin, serxwebûn e, lê ne li ser şewaza dewleta kîlasîkî ye, em serxwebûnê li ser bîngeha wê keve dîxwazînan." Serokê Kongra Gel li ser wê bawerê ye ev model tenê pîrsgirêkên netewan çareser nake, herwiha pîrsgirêkên olî û mirovî, yê jinan, jîngeh û ekolojiyê jî çareser dike.

Kartal birbirîna ku wan di Civata Giştî ya Kongra Gel de bî berfirehî behsa tekûna Tamiilyan kirine û wiha axifî: "Tevgera me û serokatiyê wê derbarê de hişyar in û me xwe jî bo her bûyerê amade kiriye. Niha ku behsa çareserîyê tê kirin, ew nayê wê wateyê ku her tîştê kuta bûye û biryar li ser her tîştê hatiye dan. Hin dewletên mezî û bî taybet Tirkiyeyê, dîxwazîna armanc bî dilê wan be. Lê ne gelê Kurdistanê gelê Tamiî û ne coxrafiya Kurdistanê jî coxrafiya Tamiî ye."

'29'ê adarê bû serkeftin'

Bi berçavgirtina gotûbêjên Ahmet Türk û Erdoğan, piştî wê ku ligel Balyozê Amerika li Tirkiyeyê civiyan, Serokê Kongra Gel wiha nerînen xwe tine ziman: "Em dizanin ku Amerika dostê herî nêzik ê Dewleta Tirkê e û bî armanca jî holê rakirina Tevgera Azadîxwazîya Kurd, çî jî dest wan hat kirin. Lê pîrsgirêkê jî hin di cihê xwe de ye, lewra em jî wan welatan siyasetek jir û maqûl çaverê dikin. Erdoğan gelek hewl da ku DTP'ê jî PKK'ê veqetîne, lê nekari. Jiber di Hilbijartinên 29'ê adarê isal de Kurd biserketin."

Li gor agahiyên Kartal, meha pêşîn, DTP borîya nûnerîya xwe li Amerika vedike. Ev jî beşek e ji qebûlkirina wan jî aliyê Amerika ve: "Eger gelê me tekûşîna azadiya xwe berfirehtir bike û bî biryar be, bêguman yekrêzî û yekîtiya me wisa dike ku hem Tirkiyeyê hem Amerika bî Rêber Apo û PKK'ê re rûnîn, ew jî di berjewendiyê hemû aliyên de dibê."

Hêbûna opozîsyonê wê bandorekî pozîtîf bîne'

Serokê Kongra Gel hilbijartinên 22'ê tîrmeha Parlamena Kurdistanê bilind dinirxîne û Mesud Barzanî û Parlamena nû jî pîroz dike. Lê Kartal wê yekê jî dibêje: "Mixabin berlegirtin ji Lîsta Hiwa jî bo ku di proseya de

beşdar nebe, bandoreke dike ser demokrasiya Başûr. Me wê yekê rexne kir. Em bawer in Parlamena nû jî ya ku niha heye çalakîyê dibê. Hêbûna opozîsyonê di Parlamena Başûr de piştvanîyek e bo Hikûmeta Başûr û pêşveçûna wê, em bawer in ku bandorekî pozîtîf li ser parçeyên din ên Kurdistanê jî dibê."

Kartal demokrasiyê wek bîngeha çareserîya pîrsa Kurd dibîne û dîxwazîyê li ser asta Kurdistanê stratejîyekî hevbeş pêk bînin. Kartal dibêje ku wan jî hemû partiyên siyasî ên Kurdistanê xwestîye ku belgeyekî netewî mohr bîkin û bîkaribîna Kongreyekî Netewî damezrinin. Li gel hemû partiyên din, bi taybetî jî PDK û YNK'ê daxwaz dike ku konferanseke çê bikin û stira-tejîyêkê darêjîna ku berjewendiyê gelê me tê de, bî parastin.

Remzi Kartal, bi pêşeroja siyasî ya Kurd gelek hêvîdar e û bawer e. Kartal dibêje ku, "Pêvajo wiha berdeham bike serkeftina Kurd pir durr nîne. Piştî 5 salên din emê li Wanê guftugoyekî din çêbikin."

Serokê Kongra Gel di doma hevpeyîna xwe ragihand ku wan biryar daye ew çasên ku di şêş mehan de çêkên xwe deynin, efu bikin. Kartal wiha got: "Bi taybet em dîxwazîyê nevi û zaro-kên wan di pêşerojê de di nav civakê de şermezar nebin."

'Mersûm 37' çî guhert?

(Ji Rûpela 1)

Di 1'ê tîrmeha 2009'an de jî aliyê Serokdewletê Sûriyeyê Beşar Esed ve biryareke fermî ku bi 'mersûm' tê binavkirin, bî navê "Mersûm 37" hate weşandin. Di vê biryarê de madeya 548'în hatiye guherandin. Naveroke ve madeyê niha wiha ye: "Ew kesê ku sûtê jî sivikîna cezayan werdigre, yê ku jîna xwe, xwişkê xwe, an jî kesekî jî mirovên xwe yê nêzikî bî tawanbarîya zinê, an bî tîkîliyên cînsî yê ne li rê zêft dike û dikeve yan jî zîrareke mezî dide wan, divê cezayê zîndankirinê ne kêmi du salan be."

Wek ku tê xuyakirin cezayê kesê kujer jî şêş mehan rabuye heta du salan. Guhertina ku buye ev e. Dêrdorên hiqûqî û piştgîrên mafê jinê ve yekê ga-

veke pêş lê kêmbînin. Bi tevayî doza guhertinê û rakirina hemû madeyên di Qanûna Sûriyeyê de dikin, ku bî behaneyê şerê û namûsê jî yan jî nanaparêzin.

Yek jî wan parêzerê Kurd Mistefa Oso di gotareke xwe de wiha dibêje: "Wê ev guhertina nû kuştin û şerjêkirina jinan bî sinor neke, ji ber ku kujer dikarin bî rehetî jî gelek madeyên din yê Qanûna Cezayê Sûriyeyê, wek (242-240-239-192) sûtê wergirin. Ev madeyên binavkirî heta niha weki xwe mane û ti guhertin di wan de nehatiye kirin." Herwiha li gor ditîna wî ya gelek mafparêzên çalak li Sûriyeyê ev qanûnên pêkhatî yê ku rê didin kuştina jinan û bî cezayekî sivik kujerîyan jî tawanbarîyê rizgar dikin, qanûnên li dijî destûrê Sûriyeyê bî xwe ne, jî bili ku

ew li dijî hemû peymanên navneteweyî yê mafên mirovan in, yê ku hikûmeta Sûriyeyê imzeyê xwe avêtiye bin wan.

Gelek caran jî ev tawanbarîyên kuştinê bî sedemên din tene kirin û bî behaneyê kuştina jî bo namûsê tene binavkirin, da ku sûtê jî sivikîna cezayê di qanûna pêkhatî de bibînin. Ev dêrdor dibînin ku pêdiviyekê mezî bi guhertina van qanûnên kevin heye, nexasî ku zêdeyî pîncî salî di ser danîna wan re derbas buye û ev yekê dihele ku nivê civakê jî hêla nivê din ve herdem û hêrgav di bin tehdida kuştinê de bîmîne. Divê ku kuştina jinê jî bo namûsê mîna hemû tawanbarîyên kuştinê bîne nîrxandin û weki jîdestgirtina mafê jîyanê lê bê nerîna û bî cezayekî giran bî pêşwazîkirin.

Rûdaw

Şertên Abonetiyê

Ji bo salekî:

Almanya, Belçîka, Awûstûrya, Fransa, Hollanda: 60 Euro · Swîsre: 120 CHF · Bîrtanya: 60 GBP
Swêd (Schweden): 900 SEK · Danîmarka (Danemark): 600 DKK · DYA (USA): 100 USD
Kanada: 120 CD · Tirkiyeyê: 100 TL

Ji bo şeş mehan:

Almanya, Belçîka, Awûstûrya, Fransa, Hollanda: 30 Euro · Swîsre: 60 CHF · Bîrtanya: 30 GBP
Swêd: 450 SEK · Danîmarka: 300 DKK · DYA (USA): 50 USD · Kanada: 60 CD · Tirkiyeyê: 50 YTL

Ji bo Almanya:

Rudaw Media GmbH · Bank: Deutsche Bank Köln · Konto Nr: 2450161 · BLZ: 37070024

Ji derveyî Almanya: IBAN: DE48370700240245016100 · BIC: DEUTDE33HAN

Navnîşan: Rudaw Media GmbH · Gutenbergstr. 63a · 50823 Köln / Almanya

E-mail: info@rudaw.de

DYA şer prîvatîze dike



Serwisa Cîhanê - Yek ji firmayên ku serkeftî şerê Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê (DYA) li Iraqê li paş xwe hiştin, firmaya Amerîkaniya ewlekariyê Blackwater Worldwide e. DYAYê ji ber hevkarîya bi vî firmayê gelekî hat rexnekirin û bi privatîzekirina şer hat sûcdarkirin. Niha ji xebatkarên berê xwediyê vî firmayê bi tevgerina wekî di "Serferî Xaçperestan" tawanbar dikin.

Firmaya Blackwater bi hevkarîya xwe ya bi leşkerên DYAYê bi milyonan Dolar qezenc kirin, lê awayê xebata wê di van salên borî de çendin caran bû mijara niqaşan û hikûmeta DYAYê ji ber hevkarîya bi vî firmayê re gelekî hat rexnekirin. Di dema hikûmeta kevneserokê Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê (DYA) George W. Bush de istixbarata wî welatî CIAyê ji sala 2004'an ve pilana wêyekê dikir, ku bi hevkarîya firmaya ewlekariyê ya privat Blackwater Worldwide sûiqasta li dijî endamên Al-Qaida pêk bîne. Li gor agahi-

yên rojnameya Amerîkî New York Timesê, CIA destpêkê hewl dida ku bi sixurên xwe wan kesên dijber ji ortê rake, lê ji ber pirsîgîrêkên huqûqî û diplomatîk wan di dawîya sala 2004'an dest bi wêyekê kir, ku karkerên firmaya Blackwater bike hevkar û ew bi kuştina wan kesan wesifedar kir. Wekî ku New York Times radigihîne, xebatkarên CIAyê anonim daxuyandine ku ew hevkarîya di navbera wan û firmaya Blackwater tu carî ji asta destpêkê derbas nebuye û jixwe tûkes ji nehatiye kuştin.

Blackwater yek ji mezintirîn firmayên private ku ji sala 2003'an û virde li Iraqê di şerkirin û karê jînuveavakirina wî welatî de xebitiye, heta di operasyonên leşkerî de ji şeranan Blackwaterê çih girtin. Dijberên vî pratîkê DYAYê bi "Privatîzekirina Şer" sûcdar dikin. Di navbera sala 2002'an û 2006'an de firmaya Blackwater li Iraqê bi nîrxê zêdetirî 1 milyar Dolaran kar ji desthilata Amerîkî wergirt. Tê gotin ku avakerê Blackwater

û aligirê Partiya Komarger Eric Prince, ku berê leşkerê timekî taybet bû, beyî tu peymanî li ser daxwaza hikûmeta DYAYê gelek kar meşandiye. Piştî demekê serokê "Beşa Şerkirina li dijî Terorê" ya CIA Cofer Black wekî şewirmend derbasî rêveberîya Blackwaterê bûbû. Piştî buyedarka di ilona 2007'an li Bexdayê, ku di encamê de 17 kesên sîvil hatin kuştin û şeranan Blackwaterê ji tevî vî bûyerê bûbûn, piraniya wan peymanên di navbera DYAYê û wî firmayê hatine betalkirin. Ji ber zextên raya giştî Blackwater mecbûr ma ku di gulana borî de xwe bi temamî ji Iraqê vekîşîne. Herçiqas Blackwater ji bo "paqîjkirina" xwe navê xwe ji guhert û kir "Xe Services LLC", lê ew ji rojevê dernakevê. Niha du xebatkarên berê yê wî firmayê xwediyê wî Eric Prince bi kuştina kesên sîvil û çendin karên din yê neqatûnî sûcdar dikin. Xebatkarên berê idîa dikin, ku Eric Prince zext li wan kiriyê ku şidetê bikarbinin û xwe wekî kesekî li ser rêça Se-

fera Xaçperestan dihesiband. Erik Prince wekî sembola gelek tekûnên di salên destpêkê yê DYAYê li Iraqê tê ditin.

Di vî navberê de serokê nû yê CIA Leon Panetta ew bernamêya bi zanbûn kuştina kesên dijber rawestand. Wekî ku tê bahskirin Panetta hênû di hezîrana borî de ji aliyê xebatkarên CIAyê di derbarê wê bernamêya bi dîzi hatîye agahdarkirin û wî ji Kongresa DYAYê agahdar kiriyê. Wekî din eşkere bû ku hikûmeta berê ya DYAYê beyî agahdarkirina Kongresa wî welatî ew bernamêya veşartî meşandiye. Tê idîakirin ku bernamêya bi fermana cigirê George W. Bush yê wê demê Dick Cheney hatîye rêvebirin. Li jêra şopandina karên istixbaratan ya Parlamena DYAYê di vî navberê de ket dewrê û dest bi lêkolînan kir, ka CIA anjî Cheney di karên xwe de qanûn binpêkirine an na. Li DYAYê ji sala 1976'an û virde hatîye qedexekirin, ku CIA bîrê nav hewldana kuştina kesekî, anjî kesekî bi kuştina yekî din wesifedar bike. Ev biryar ji aliyê Serokê wê demê yê DYAYê Gerald Ford ve hat dayîn, piştî ku pîlanên CIA ji bo kuştina Fidel Kastro eşkere bûbûn. Desthilata Bush endamên Al-Qaidayê wekî aliyekî şer û şeranan dîjîmîn binavdikirin û ji ber wê yekê ji desthilata Bush xwe bi wê qanûnê ve girêdayî nedidit.

Iraq jî dibe dijminê Înternetê?

Hewlêr (Rûdaw) – Hikûmeta Iraqê bi idîaya astengkirina malperên nesincî û yê rêxistinên radikal di nav hewldanan de, ku sistemeke filterkirina internetê bicîh bike. Ev hewlên hikûmetê ji aliyê hinek parlamenter û rêxistinên rojnamevanên Iraq û Kurdistanê wekî pinpêkirina desturê û destpêka sinorkirin û çavdêriya internetê tî rexnekirin.

Wezareta Navxweyî ya Iraqê di vî derbarê de daxuyand, ku ew dixwazin bi sistemeke wiha bi taybetî malperên pornografîk û bi giştî jî yê ku bi şert û edetên Ola Islamê û çand û normên civakê ne gunçav bin û li pêş hevîrtîna malbatî dibin asteng, bisinor bikin. Dijberên sansûra internetê dibêjin ku eger carekê bi sedema parastina ol û sinsê dest bi sansûrê bê kirin, wê di demekî nêzik de ev astengî derbasî gelek beşên din yê internetê jî bibin û li pêşiya azadîya xweîfadekirinê bibê asteng.

Li ser van hewldanên Bexdayê Rêveberîya Giştî ya Wezareta Ragihandinê ya Herêma Kurdistanê da xuyakirin,

ku ew ne ligel vî siyaseta Bexdayê ne û bi tu awayî ew biryarekî wiha bicîh nayînin. Rêvebirê Giştî yê Wezareta Ragi-handîne Karwan Şex Reza di wê derbarê de ji bo Rûdawê wiha got: "Ji ber ku em bawer in ku danîna filterê li ser internetê dikeve çarçoveya binpêkirina mafê mirovan di warê wergirtina zanyariyan de, tu niyeta Wezirê Ragihandinê li Herêma Kurdistanê ji bo bicîhkirina tu awayê filterkirina malperên internetê nîne." Karwan Şex Reza herwiha got ku hikûmet ne amade ye û nikare biryareke wiha bicîh ji bike, ji ber ku beşekî çavkaniyên internetê Kurdistan rasterast ji hewa û beşa din jî bi sim û kabloyan ji Tirkiye digihîje Kurdistanê.

Hewleki Hikûmeta Bexdayê ya di vî rengî beriya demekê pêk hatibû. Di bihara borî de Wezareta Çandê ya Iraqê nivisek li çapxaneyên pirtûkan belav kiribû û tede jî wan xwestibû ku ew listeyeke pirtûkên xwe tevî kurtenavero-ka wan jî wezaretê re bişînin. Pirtûkên ku xeter bûn nîrxandin, divê ne bûn çapkirin.

Afxanistan:

Hilbijartin erê, guherîn na!

Serwisa Cîhanê - Pêncşema borî li Afxanistanê cara duyem piştî rûxandina rêjîma Talibanan hilbijartinên Serokatîyê pêk hatin. Ji bo Serokatîyê 37 kesî xwe berbijêr nişan dabûn, lê tûkes ne li bendê ye ku Serokê Afxanistanê yê niha Hamid Karsai ji desthilatê bê dûrxistin. Talibanan jî tehdida xwe bicîh anîn û bi dehan kes kuştin. Gelek derdorên siyasî li Afxanistanê û li derve pevajoja hilbijartinan rexne kirin û hilbijartin wekî nedemokratîk û ne rewşa binavkirin.

Rojekê piştî Hilbijartinan hem Hamid Karsai, û kevnewezîrê derve Abdulah Abdulah, daxuyandin ku ew di hilbijartinan de bi ser ketine. Herdû jî wekî çavkaniya serkeftinê aligirên xwe yê çavdêrên li ser sindoqên dengdanê nişan didin. Çavdêrên siyasî li ser van daxuyaniyên Karsai û Abdulah gumanên xwe tinin zîman û dibêjin ku eger herkes beyî ku deng hatibin jimartin bi serê xwe serkeftina xwe ilan bikin, ew dikare rê li şerêkî navxweyî ji veke.

Ji xwe beriya hilbijartinan Talibanan banga boykota hilbijartinan kirin û çendin çalakî li dijî amadekariyên hilbijartinan pêk anin. Di roja hilbijartinan de bi dehan kes hatin kuştin û birindar kirin. Ji ber tehdîdên Talibanan li hinek herêmên Afxanistanê rêjeya dengdanê tenê ji sedî 10 heta 15 bû, li tevaya welat jî ev rêje di navbera tenê ji sedî derdora 40 heta 50 bû. Ji bîli hewlên Talibanan jî bo tekbirîna hilbijartinan, hikûmeta Karsai jî ketibû nava hewldanên mezînan, ji bo ku encaman li gorî daxwaza xwe amade bike. Li gor ihtîmalan di navbera 15 û 17 milyon dengdêran navê xwe qeyd kiribûn. Ya rastî tu kes hejmarê du-



rust nizanê, heta Komîsyona Hilbijartinan bixwe jî vî hejmarê nîzane û pirsîgîreka yekê di vir de dest pê dike. Li gor çavdêrên siyasî jixwe pêwîstî bi hilbijartinan tune, ji ber ku encam beriya hilbijartinan eşkere ye û serokê nû wê diha Hamid Karsai be. Hilbijartin jî wekî çavgirtina xelkê hate binavkirin.

Tê gotin ku Karsai beriya hilbijartinan sistemeke gendel li derdora xwe ava kiriyê û tîra xwe deng kirine û bi vî yekê desthilata xwe misoger kiriyê. Li gor agahiyan Weqfa Almanî ya Lêkolînkirina Aşti û Tundûtîjîyê 'Hessischen Stiftung Friedens- und Konfliktforschung' li gelek herêmên Afxanistanê bîngêhen dengdanê tunebûn, anjî gelekî ji malên dengdêran dîr bûn û bi vî yekê gelek hemwelatî nekariyên hilbijartinan, hikûmeta Karsai jî ketibû nava hewldanên mezînan, ji bo ku encaman li gorî daxwaza xwe amade bike. Li gor ihtîmalan di navbera 15 û 17 milyon dengdêran navê xwe qeyd kiribûn. Ya rastî tu kes hejmarê du-

Buyereke din ku gumanên li ser rewabûna hilbijartinan mezintir dike vegera generalê Ûsbekî Raşid Dostûm e. Ji bo ku Karsai dengê Ûsbekîyan bigre bi Dostûm re ket nava bazarê. Dostûmê ku li bakurê Afxanistanê xwedî bandore û wekî kesê kilit tê hesibandin piştî demekî dirêj li sîrgûna li Tirkiyê, ji ber soza Karsai ku ewê postekî bilind bide wî, vegeriya Afxanistanê. Wekî ku tê gotin Karsai bi gelek serokeşîrên din jî li hev kiriyê, ku beramberî dengdana jî bo wî, ewê di gelek waran de zêde tekkilî karên wan – wekî qaçaxtiya li ser sinor û bazara narkotîkê – nebe.

Ji bo parastina hilbijartinan 100 hezar leşkerên biyani yê hêza ISAFê û 200 hezar leşkerên Afxanî di alarmê de bûn. Çav rê ye ku encamên fermî yê pêşîn di 1'ê îlonê de bûn eşkerekin. Eger berbijêrekî di dewra yekê de biserneket, wê di navbera herdû kesên xwedî herî zêde deng di 1'ê cotmeha bêde wê ji nu ve dengdan pêk werê.

Afrika:

Mehê 2 milyon zêde dibin

Serwisa Cîhanê - Ji ber birçibûnê salane li Afrîkayê bi milyonan mirov jiyana xwe ji dest didin, ji aliyê din ve herkû diçe hejmara şênîyên vî parzemîna ji zêde dibe. Lêkolînerên peresandina şênîyan li bendê ne, ku ev pêşveçûn di pêşerojê de bibê sedema keçberiyên mezînan.

Li gor raporta isal ya Weqfa Almanî a Niştêcihên Cîhanê 'Deutsche Stiftung Weltbevölkerung' (DSW) û ya Amerîkani Population Reference Bureau ku li ser rewşa şênîyan cîhanê hatîye amedekirin, di 25 salên borî de hejmara mirovên ku li parzemîna Afrîkayê dijîn duqet buye.

Di raporte de hatîye gotin ku niha li Afrîkayê bêtirî 1 milyar mirov dijîn û mehane 2 milyon lê zêde dibin. Li tu dewereke din ya cîhanê hejmara mirovan wekî li Afrîkayê zêde nabe.

Herçiqas jî destpêka 1990'an û virve leza zêdebûna niştêcihên Afrîkayê hinekî kêmbûye jî, lê li gor îstatîstîkên rêxistinên navnetewî hejmara şênîyan Afrîkayê wê di sala 2050'î de 2 milyar derbas bike. Niha derdora 6,8 milyar mirov li cîhanê dijîn. Her deqîqê hejmara mirovên ku dijîn ji 156'an zêde dibe. Saetê ev 9354 kesin, rojê 224 hezar, mehane 6,83 milyon û salê jî hema 82 milyon e. Heta 2012'an wê 7 milyar mirov li cîhanê bijîn. Li gor texmînên Netewên Yekbûyî hej-


mara mirovan wê di sala 2050'an de 9 milyar derbas bike.

Herçiqas tê çavêrkirin ku zêdebûna mirovan di demên pêş de hinekî kêmbûye, lê ev pêvajoya wê li herêmên cîhanê ne wekî hev pêşve herê. Tengasiya herî mezînan jî wê welatên xizan bîkîşînin. Li gor texmînên hejmara şênîyan Afrîkayê wê herî zêde mezînan bibê û ji niha jî sedî 15 mirovên ku dijîn di sala 2050'î de bibê ji sedî 21,8'ê wan.

Şênîyan Afrîkayê ne tenê zû zêde dibin, rêjeya yê ciwan jî mezînan. Hejmara şênîyan Ewropayê niha 738 milyone û ev hejmar wê di sala 2050'î de 702 milyon be. Tenê ji sedî 15'ên Ewropîyan jî 15 salan ciwantir in, lê ji sedî 16 wan di ser 65 salan dene. Li Afrîkayê rêjeya miron di ser 65'an de tenê sê ye, lê ji

sedî 41'ê Afrîkaniyan temenê wan jî 15 salan ciwantire. Afrika ne tenê parzemîna xwedî niştêcihên herî ciwane, welatên li başûrê Çola Saharayê li cîhanê yê herî xizandin jî. Ji ber ku ev hejmara zêde ya mirovan dibe sedema xizaniyê jî û bîperspektîf bûn hin mezintir bibê û ji aliyê din ve ciwanên Afrîkayê bi riya televîzyonan jî wê yekê haydarin, ku jiyanekî xweştir li derveyê Afrîkayê mûmkune, ev rêwê wê bibê sedema wêyekê, ku daxwaza guhertinan li parzemîna wan jî mezintir bibê.

Daxwaza guhertinan û rastiya jiyanan wan dikare di pêşerojê de bibê sedem, ku pirsîgîrêkên di nava civakên welatên Afrika hîn alozîtir û hejmara koçberên ber bi Ewropayê ve jî mezintir bibê.



Parlamentera Alman Ulla Jelpke:

'Kurd dereng dest bi kar dikin'

(Ji Rûpela 1)
Sharo I. Garip
Dortmund (Rûdaw) -

Die Linke (Partiya Çep ya Almanya) di sala 2007'an de bi yekbûna Partiya Sosyalist ya Demokratik (PDS) û Alternatîf Hilbijartinan ya Dadwariya Kar û Civakê (WASG) hate damezrandin. Hevserokên partiyê Oskar Lafontaine û Lothar Bisky ne. Vê partiyê di hilbijartinên giştî yên Almanayê yên di sala 2005'an de % 8,7 yên dengan wertir. Gelek hilbijêrên vê partiyê kurd in û herwiha kevneparlamentera esilkurd Feleknas Uca ji endamê vê partiyê ye. Me bi Berdevka Karê Hundur ya vê partiyê Ulla Jelpke re li bajarê Dortmundê hevpeyvînek pêk ani:

Li welatên ku faşîzm buye serdest, partiyên çep di nava civakê de zû çihên xwe digirin lê belê li Almanayê rewşeke berevajî heye. Sedemê vê yekê çi ye?

Gelek sedemên wê hene. Piştî 1945'an Partiya Sosyaldemokrat gelek bi hêz bû. Ya din Almanya ji sedî sed ji Faşîstan nehat paqijkirin. Faşîst bi agahiya Amerîkîyan di nav polis û rexistînan veşartî de hatin şixulandin. Di destpêkê de şerê bi navê "antî-komunîzm" li hemberî çapan hat meşandin. Partiya Komunist a Almanayê (DKP) di sala 1956'an de hat qedexekirin. Faşîstan bi pirani çepgir qirkiribûn. Yên ku mayî ji bo alîkariyê derbasî DDR bûbûn. Piştî rakirina qedexeya DKP, wek xelateke îdeolojîk û siyasî ji (Partiya Netewperestên Demokrat) NPD hat serbestkirin.

Em vejerin roja îro. Piştî yekbûna PDS û WASG medyayê gelek caran dî-

vist ku dubendî di nava partiya we ya nû Die Linke de heye...

Ji bo partiyeke nû nakokiyên navxweyî normal in. Ji ber ku nivê partiya me ji siyaseta sosyalist û nivê din ji tradîsyona sosyaldemokratîkê tê. Lê medyayê êrişên anti-komunîstî li ser me pêk tanin. Medyayê qala program, siyaset, daxwazî û prensîbên me nekirin, lê belê êriş pêxistin.

Medya niha çawê nêzikî we dibe?

Medya wisa dike, weki ku partiyê bi navê Die Linke. Ev ji taktîkeke hilbijartinê ye. Gotinên me gelek caran li ber çavan nayên girtin yan ji dest lê diwerdin. Ev bi salan e ku em dixwazînin baca malê ya ji dewlemen dan were girtin. Berî demê "Komelaya Mafparêziya Bacdar" hesab kiriye ku 25 milyar euro dikare ji maldaran were wergirtin. Ev bû babeteke sereke ya medyayê lê belê ev bi salan e ku em ji behsa vê yekê dikin û medya cih nadiye. Wek din tiştên ne rast ji tîp çepkirin. Van rojan hat nîvîsandin ku "partiya me li eyaletên Saarland û Thüringen bi ser bikeve, wê nexwaze bibe hikûmet. Tişteke wisa nin e, Lafontaine û Ramelow ji ev gotin vale derxistin.

Rêzîknameya we li ser dad, aşiti, azadî û wekhevîyê ye. Lê Partiya Kesk minakek xweş da me ku çi gava hêza hikûmetê kete di destên wan de, ew prensîbên wan ji tîp çûn. Gelo xeterek wiha ji bo we ji heye?

Di parlamena Almanayê de tenê em li gor gotinên xwe tevigerin. Tenê em li diji şandina lêşkerên Alman ya li Afganistan

û Somalyayê ne û herwiha em li diji yasaya Hartz IV ne. Peryên vê yasayê têra debara jiyanê nakin. Li ser meseleyên mina integrasyon, siyasetê li ser biyanîyan û edaleta civakî ya herî cidî em in. Lê belê siyasetê bê liberhevhatinê nameşe û ji xwe em ne di serdema şoresan de ne lê belê ya reforman de ne. Rast e bi liberhevhatina hinek prensîbê dişikîn. Gor fikra min partiya me min li eyaletên Berlin û Mecklenburg-Vorpommernê, pir liberhevhatinê dike. Divê em li ser meseleyên girîng yê wêki taybetîkirina enerji, av yan ji xaniyan liberhevhatinê nekin.

Partiya we ji bo demokrasiya elîtan tîdikoşe. Di wari de cudahiya we ji partiyên din çi ye?

Ji demokratîkirina demokrasiya heyi em van tiştan fêm dikin: Herkes, minak karker ji li fabrikeyan tevli biryaran bibin. Pirsgirêke din kontrol û zelakirina xebatê civakî ye.

Li gora statistîkan Die Linke her diçe bi hêztir dibe, gelo ev yek bandora xebatê we ye an ji ber nerazîbûna ji hikûmetê ye?

Ey yek hinekî bi krîza aboriyê ve girêdayî ye. Herçiqas Merkel û Steinmeier bêjin rewşa aboriyê baş diçe û hejmara betalên dake-tiyê ji, ev yek ne rast e. Baweriye mirovan ji bo çareserîya van pirsgirên kan bi kesî nin e û ev yek ji bo Die Linke ji derbasdar e. Herçiqas em çareserîyê peşkêş bikin ji, disa ji mirov ji ber tirsên xwe ji strukturên kevî dest bernadin.

Rojnameya Frankfurter Rundschau di sala 2008'an de wisa nivîstibû: "Ger li rojavayê Almanayê Die



Hevkarê me Sharo I. Garip ligel Ulla Jelpke

(Wêne: Rûdaw)

Linke bendava hilbijartinê %4 derbas bike, sedema vê yekê bi pirani Kurd in. Gelo biqasî Kurd dengên xwe didin we, hûn Kurdan dikin namzetên ku misogeriya hilbijartinê wan heye?

Na, ev ne tenê bi Kurdan ve girêdayî ye. Em li Almanayê 5 milyon deng distinin. Lê rastiyek heye: Kurd ji dema PDS heta îro ji partiya me re dirozî. Ev yek ji ber siyasetê me ye. Ez bi xwe herçar parçeyên Kurdistanê baş nas dikim. Weki minak, min bi xwe li diji bindestiya Kurdan, ji bo serbetiya kesayeti û zîmanê Kurdan gelek xebat kir. Li hemî ber teşqelêyên wêki qedexekirina PKK'ê, min gelek tekoşin da. Zordariyê li ser Kurdan ya li Almanayê bi du armancan e: Pêşbirina tevgeran Kurdan û piştigirtina Almanan bi Kurdan re.

Tê gotin ku partiya we ji endamên we yê Kurd dixwaze ku ji PKK'ê dûr bin. Helwesteke wisa heye?

Kurd bi siyasetê hundirîn gelekî tî kriminalîzekirî. Bi rastî bandore vî siyasetê li ser partiya

me ji heye. Pir kes di nava partiya me de ji ne Kurdan û ne ji PKK'ê baş nas dikin. Ji ber vî yekê gelek kes ditirsîn. Ez bi xwe ne sempatîzanê PKK'ê me û rexneyî min ji car caran li ser PKK'ê hene; lê piştigiriya min bi Kurda re ne bêrexne ye.

Partiya we dibêje em li diji şer in. Çima hûn hewlîna dibin bîbin navbeynkarê aliyên şer yê li Bakurê Kurdistanê?

Em herdem hazir in. Min ji Talabani û Barzani re ji behsa van tiştan kir. Lê pîrs ew e ka gelo heza partiya me dibe ku din vî bari de rabe yan na. Ya din ji ev e; dewletê din guhdariya me nakin. Lê me li Almanayê ji bo aşîtiyê û çareserkirina pîrsgirêka Kurd gelek çalekî kirin. Min bi xwe di sala 1993'an de li Nîsêbinê dit ku Kurd çawa bi çek panzerê Almanan hatin kuştin. Me wê demê li hemberî şer gelekî li ber xwe da. Hans Dietrich Genscher wê demê panzerfiro-tana ji bo Tirkîyeyê rawestand. Lê lobiya firmayê çekan pîrs girêka Kurdan û diji şerê Kurdan gelekî li ber xwe da. Hans Dietrich Genscher wê demê panzerfiro-tana ji bo Tirkîyeyê rawestand. Lê lobiya firmayê çekan pîrs girêka Kurdan û diji şerê Kurdan gelekî li ber xwe da. Hans Dietrich Genscher wê demê panzerfiro-tana ji bo Tirkîyeyê rawestand. Lê lobiya firmayê çekan pîrs girêka Kurdan û diji şerê Kurdan gelekî li ber xwe da. Hans Dietrich Genscher wê demê panzerfiro-tana ji bo Tirkîyeyê rawestand.

Di axaftina we de navê Feleknas Uca derbas bû, ew êdî ne parlamentêr e. Gelo çima niha kesekê/keseka esilkurd ne parlamentêr e?

Rast e, lê ez ji dixwazim rexneki bikim. Gelek kes di nava Kurdan de Feleknasê dinasin û Feleknasê ji ji bo Kurdan xebatê baş kir. Lê belê Feleknas xwe di nava Almanan de neda naskirin. Di nava partiya me bi xwe de hê hinek wê nas nasnakin. Diviyabû profîleke taybet ya Feleknas di nava Almanan de hebûya. Dema li ser pîrsgirêka Kurd tî axaftin, direktê ez tî me bîra Almanan. Partiya me xwast piştî Feleknasê, Songül Karabulut bixe di parlamentoyê de lê dem pîrs kurt bû. Hem kêmasîyên me û hem ji yê rexistînan Kurdan çêbûn. Pêwîste mirov ji bo tiştên wisa zû dest bi xebatê bike. Em dixwazînin di hilbijartinê de me de bi kêmasî ve Kurdek bikeve parlamentoyê.

Gotina we ya dawiyê...

Ez bawer dikim ku ezê carek din ji bêm hilbijartin. Ez dixwazîm careke din xebat û siyasetê baş ji bo Kurdan bikim.

Almanya:

Li aşxaneyên Çînî koletiya hemdem

Köln (Rûdaw) - Heftaye borî bi mebesta bîdestxistina delîlên di derbarê şebekeyekî Çînî de bi giştî 2000 polîsan li seranserê Almanayê di 180 restorant û malên Çînîyan de lêgerîn pêk anîn. Di wan serdegirtinan de gelek peymanên kar û kompûter hatin desteserkirin.

Karkerên ku ji Çînê bi sozê mezin tî xapandin, li kargehên Çînî li Almanayê di bin şert û mercên nemirovane de tî xebitandin.

Piştî ku beriya salekê şikayet gihiştin dozgeriya bajarê Hannoverê, ku ajansêkî karpeydakîrinê di nav karê neyasayî deye û kesên Çînî ji bo xebatîkirina reştînê Almanayê, dozgeriya wî bajari dest bi lêkolînan kiribû û di adara borî de du mîr (46 û 38 salî) û jîneki Çînî (35) hatibûn binçavkirin. Ajansa navborî pêwendiyê di navbera nanopêjê Çînî û restorantê Çînî de li Almanayê durust dike. Li gor peymanekî di navbera herdu welatan bi mebesta naskirina çanda hevdu kesên pispor dikarên ji bo dema çar salan werin Almanayê û li vir kar bikin. Hersê kesên ku di adara borî de hatibûn binçavkirin bi wê yekê tî şûndarkirin, ku wan li Hannoverê bi armanca bazîrganîya mirovan ajansêkî kar avakirîyê û bi anîna kesên Çînî herî kêm du milyon Euro qezenc kirine.

Tê gotin ku karkerên Çînî bi sozê mezin tî xapandin û ji



Çînî tinin Almanayê. Ji bo anîna karkeran ajansa navborî di navbera 5000 û 12 000 Euro ji wan distendin. Ji ber ku piraniya wan karkeran li Çînê xizanî û wan pereyan nikarin bidin, ew li Almanayê mecbûr dibin ku li beramberî wan pereyan bixebitin û bi vî awayî bi wan şebekeyan ve tî girêdan. Hat ragihandin ku karkerên ku heqdesta wan saetê kêmtirî sê Euro ye, heftane derdora 80-90 saetî tî xebitandin û mecbûrî jiyanekî koletiyê tî kirin.

Li gor lêkolînê Saziya Şopandîna Tewanan ya parêzgeha Niedersachsenê (LKA) ajansa navborî di dehsalên borî de derdora 1000 kesên Çînî derbasî Almanayê kirine. Berdevkê LKA'yê Frank Federau got ku ew kes weki kolyan dihatin xebitandin: "Ew ketibûn nav destê

xwedanên restorantan, wan çî dixwest bi dikirin. Ev koletiya nûjen e. Kovara Almanî 'Der Spiegel' li ser vî babetê nivîsandin ku kesekî Çînî heftane 7 rojan dihat xebitandin, doşêkek raketîni ji bo wî li odeya kincan de hatibû bicikirin û xwarina wî ji tenê birinc, makarne û kelemên çînî buye. Heqdesta wî karkerî ji mehane 300 Euro buye. Spiegel dibêje ku dema wî kesi ji ber rewşa nebaş ya kar nerazibûna xwe gihandiyê ajansa kar, ew bi paşveşandina Çînî hatiye tehdidkirin.

Li ser îdiayên ku dibe li paş vî kari Çeteya Çînî ji hebe, rayedarekî Almanî daxuyandin ku wan heta niha tu pêwendiyên hersê kesên Çînî Mafya Çînî kişî nekirine, lê ihtîmal heye ku di pêvajoya lêkolînan de hin kesên din ji bînin binçavkirin.

Namzetên Kurd bi hêvî ne

Köln (Rûdaw) - Îsal li Almanayê sala hilbijartinan e. Di mehên derbasbûyî de hilbijartinên Parlamena Ewrûpayê çêbûn û wê di 30'ê tebaxê de ji hilbijartin li hinek eyalet û li gelek herêman çêbibin. Herwiha di 26'ê elûnê de hilbijartinên giştî ji li Almanayê pêk tî. Herwiha gelek almanên ku bi eslê xwe biyanî ne ji bûna namzetên partiyên siyasî. Ji hêla din ve ji derdora 15 milyonên biyanî yê li Almanayê dijin, zêdeyî nivê wan bûna hemwelatiyên alman û bi vî awayî mafê kesên ku temenê wan ji 18'an derbasbûne yê hilbijartinê çêbûye.

Me li ser vî yekê ditînin hinek namzetên ku bi eslê xwe Kurd in ji bo xwendevanên Rûdawê standin:

Malik Karaman ku bi eslê xwe Kurd e û li Doğanşihira Malatya'yê hatiye din, ji partiya SPD namzetê Meclisa Bajarê Kölnê ye. Ew di rêveberîya herêmi ya partiya xwe de cih digire û endamê Meclisa Biyanîya ya Bajarê Kölnê ye. Ew bi xwe ku Şewirmendê Darayî ye, dixwaze dema ku were hilbijartin di nava Komîsyona Aboriyê de cih bigire.

Ali Atalan ji jî Midyatê ye û Zanîstê Siyasetê ye. Ev 5 sal in ku ji partiya Die Linke endamê Meclisa Bajarê Münstêrê ye. Ew di van hilbijartinê de ji disa



Ali Atalan



Agit Boztemur

ji heman partiyê ji bo endamê bûna heman meclisê pêşbazîyê dike. Di hilbijartinên derbasbûyî de tenê Atalan kari weki endamê Die Linke bikeve di meclisa bajarê de. Ji wê yekê wî di nava piraniya komîsyonên meclisê de cih girt. Atalan dibêje ku bi 3 kesên koma meclisê tê avakirin û ew li bendê ye vî carê bi 4 kesên bikevin di meclisê de. Ali Atalan herwiha di nava rêveberîya partiya xwe ya eyalata Nordrhein Westfalen de ji cih digire. Ew li ser siyaseta partiya xwe jî wisa diaxive: "Die Linke di wê barîyê de ye ku divê gelê Kurd bi awayekî azad bijî. Partiya min hevalbendê çareserîya pîrsgirêka ya aşîyane ye. Me weki eyaletê heyetêk ji bo

Newroz û Hilbijartinên li Bakurê Kurdistanê û li Tirkîyeyê rekir. Piştigirtî partîya me bi awayekî sempatik nêzikî Kurdan dibin."

Namzetekê din yê Kurd Agit Boztemur e û ew jî li Velbertê ji bo Die Linke dixwaze bikeve di meclisa bajarê xwe de. Ew bi xwe jî Çewlîgê ye û diçe pola 13. Taybetiya wî jî ew e ku ew li bajarê xwe namzetê herî ciwan e. Boztemur jî dibêje eger ew were hilbijartin, ewê bibe nûner û dengê biyanîyan. Wî herwiha jî bo propagandaya xwe ya hilbijartinê digel kurdi, bi gelek zîmanan belavok dane çapkirin. Ji bili Boztemur, Servet Halis jî bajarê Depê jî ji heman partiyê namzetê Şaredariya Bajarê Velbert e.

Opera bi kurdî nivîsand

(Ji Rûpela 1)

Mehmet Sebatlı

Köln (Rudaw) - Cara yekem e ku di dirok û hunera Kurdan de keseki librettoya operayê dinivîsine. Ev kes Kurdekî ji Gurlistanê, Casimê Wezir e. Casimê Wezir herwiha li Kölnê dibistana sinemayê vekiriyê û niha bi 30 şagirtên xwe re rêzefilmek amade dike.

Operaya ku beriya 500 salan li Italyayê derket, niha dikeve nav hunera Kurdan. Hunera Kurdan ji aliya muzik û teatrê ve gelek xurt e. Lê belê cara yekem e ku ev herdu beşên hunerê digihine hev û dibin hunerê nûjen. Ango opera. Lê sahnkirina operayê ne hêsan e... Jê re sermayeya dewletan, hunermendên taybet û temaşevanên heyrane hunerê divên.

Casimê Wezir, di sala 2002'an de dest bi librettoyê, anga nivîsara operayê kiriyê. Nivîsandiye û navber dayê. Di navberê de senaryoyan nivîsandiye, li ser kişandina filman xebitiye û di sala ser operayê xebitiye. Tenê dramaturjiya operayê ji 60 rûpelan zêdetir e. Mijara operayê li ser jiyana Evdalê Zeynikê ye û navê



(Wêne: Rûdaw)

wê 'Evdalê Zeynê' ye. Me ev yek pirsî. "Ez şexsiyeta wi nêzê ruhê xwe dibinim. Ez ji wek wi bi eslê xwe Serhedî me. Ew ne tenê dengbêj bû, herwiha muzikvan ji bû. Helbest, muzik û folklor bingeha operayê ne. Ji bo ez wi rasterast karibim binivîsinim min 6 çavkaniyên cuda, wek pirtûkên Mehmed Uzun, M. Emin Bozarslan lêkoland."

Bê dijbertî huner nabe

Casimê Wezir diyar dike ku Evdal bi deng û stranên xwe dilê jinan diheland. Li cihê ku ew dijiya, desthilatdar Sûrmeli Heh-

met Paşa bû û ji Evdal pir hez dikir. Lê wek ew dibêje tenê bi hebûna kesên wek Evdal û Sûrmeli Paşa mirov nikare libretto binivîsine. Divê dijbertî hebe, neyartî hebe, nakokî hebe. Ji bo vê yekê ji Shakespeare û berhema wî Hamlet minak dide. "Hamlet xortekî bêdeng e li sarayê diji. Nan û ava wî tê ber lingê wî. Jiyanê wî aram e. Lê Shakespeare çî dike. Bavê Hamlet ê mirî derdixê holê û bi dengê giyanê wî jiyanê Hamlet ser û bin dike. Min jî Egit bikaranî. Jina Evdal Eysê û heştgiriya wî Meryema Ermenî anî pêş."

"Folklor me ya gelê muzikal e"

Casimê Wezir jiyana Evdalê Zeynikê gelek balkêş dibîne. Jiyanê wî bixwe muzikal binav dike. Jiber ku li dora Evdal û Sûrmeli Mehmet Paşa gelek jin hene, reqs heye muzik û çûş heye. Li gor Wezir, jiyana Evdal a beriya korbûnê ne aram e. Ew vê yekê jî, ji bo hunerê dewlemendî dinirxîne.

Ne tenê jiyana Evdalê Zeynikê, gelek stranbêj, çirokên evîni jî, muzikal binav dike. "Jiyana Kurdan bi xwe muzikal û teatral (şanoyî) e. Muzikaleke gelê ye. Herwiha dijbertî û nakokî jî tê de hene. Ji ber ku Kurd, Suryanî û Ermenî bihev re dijîyan. Hinek Kurd Ezidî bûn, hinek jî Misilman. Zembilfiroş minakeke gelek balkêş e. Keçik Ezidî, kurik Misilman e."

Casim ev yekê wek bingeha operayê dibîne û wiha didome: "Evdal bi Eysê re zewicandiyê û zarokê wan heye. Lê ew jî Meryemê hez dike. Meryem keçeke Ermenî ye. Kurd (Kurdên Misilman û Ezidî) û Ermenî di nav hev de dijîyan. Balyozê Imparatoriya Osmanî li herêma heye. Osmanî zêde têkili nav Kurdan nabin. Egit, anga karakterê dijber, wek Bekoyê Mem û Zînê wan temaşe dike. Li benda rojêki ye û keyesê bibîne daxwazên xwe

pêkbine. Çavê Egit di desthilatdariya Sûrmeli Mehmet Paşa de heye; dixwaze tekeve şûna wî." Wek ku Wezir dibêje Egit bi balyozên Osmanîyan re hevkarî dike. Osmanîyan dest bi qirkirina Ermanîyan kirine. Di wê dema gengeşiyê de Sûrmeli Paşa dikujin. Evdal kor dikin, Ermenî koç dikin. Ev actiona operayê ye.

Wek tê zanin ji bo ku opera li ser sahnê were pêkhatin gelek tişt divên. Casimê Wezir pirsar me wiha bersiv dide: "8 karakterên pêş, nêzîki 30 karakterên paş jî bo hemûyan kostum; orkestraya dewlemend û divê kesên ku karibin arya, duet bikin."

Arya, anga kesekî di operayê de bi tenê deng dike; duet di kes bihev re; sê kes, terzet; çar kes kuartet...

Casimê Wezir bibirtine ku wi hin ev projeya xwe neqedan diye. He-ger alikarekî sponsor bibîne dixwaze ku operaya kurdi ya yekem bine ser dikê.

Rêzefilm amade ye

Ew niha li Kölnê bi navê Tree World Media bi 30 şagirtên xwe re li ser filmên sinemayê û rêzefilm kar dike. Wan amadekariya rêzefilmek kirine. Navê rêzefilmê Kaniya Evinan e. Ji 33 paran ku her yekî 35 deqîqe dirêj e, pêktê. Ew rêzefilmê pêşkesî Wezarete Candê ya Herêma Kurdistanê kiriyê lê belê hin bersiv nestendiye. Herwiha dixwazîna bi televizyonê Kurd re jî têkili deynin û ji wan re rêzefilm amadebikin.

Ji duh heta îro Opera

Welatê operayê bajarê Italyayê, Floransa ye. Mijareke civakî ya balkêş, li ser sahnê bi alikariya muzik û teatrê tê lidarxistin. Opera di muzika Ewropa ya klasîk de pêşkeşi herî giring e. Deng, listik û dans bihev re tenê bikaranîn. Ji bo ku opera bê sahnkirinê pêdivî bi orkestrayê re heye. Di ala 1594'an de cara yekem listikeke ku mijara xwe jî trajediya Yûnan distîne li Floransayê bi navê "Dafne" hatiye sahnkirin. Pasê di sala 1607'an de hunermendî itali Claudio Monteverdi operayêke bi navê "Orfeo" li ser sahnê bi alikariya orkestrayê birêve dibe. Piştê jî Italyayê derbasî hemû Ewropa buyê û wek muzika Ronensansê hatiye binavkirin.

Çîroka wêneyê Che Guevara



Zeki Özmen

Di 5'ê adara 1960'an de li Havanna ya paytexta Kubayê fotografkêşê kovara "Revolución" yê bi navê Alberto Korda, yek ji wêneyên ku wê di salên pêş de bûba ji wêneyên herî gelek li cihanê tê nasîn, kişand.

Di wê rojê de ku ew salek bû şoreşa Kubayê pêk hatibû, Fidel Castro jî girseyeke ku ji 100 hezar kesan pêk dihat re axaftinek dikir. Rojêki pêşiya wê li keştiyê Havannayê keştiya Belçîqî ya bi navê "Coubre" ku tije cebirxane bû, teqiyabû. Di encama teqînê de 81 karkerên keştiyê miribûn û 200 kes jî birindar bûbûn. Alberto Korda jî dibîne ku Che Guevara alikariya birindaran dike û hewl dide ku wêneyên wî bikîşîne lê belê ew destûrê nadiyê. Alberto Korda piştî hingî, di dema definkirina cenazeyan de derfetê dibîne ku gelek wêneyên Che Guevara bikîşîne. Ew ne tenê wêneyên wî, her wiha wêneyên serokwezîrê wê demê yê Kubayê û Fidel Castro ku teqîne keştiyê weki hewleke CIA bilêv dikir û yê filozof Jean-Paul Sartre û Simone de

Beauvoir ku ji bo serdanekî hatibûn vê giravê, dikişîne.

Korda wisa bahsa wê rojê dikir: "Min bi wênekêşa xwe wêneyên Fidel û kesên din dikişand. Ji nişka ve Che di objektîfê min ya 90 mm re xuya kir. Awira wî ez kelecani kirim. Min bi awayekî reflekswarî du wêneyên wî kişandin, yek bi formata dirêjkirî û ya din ya şîpyayî. Min nekari wêneyê sêyemîn bikîşînim, ji ber ew paşve çû û xwe kire nava rêza duyemîn a beşdaran."

Tenê wêneyê bi formata dirêjkirî keri Alberto Korda tê. Ji bo wêneyê baş xuya bike, ew kesê li milê çepê yê li pêşiya Che Guevara û her wiha çîqilê dara palmiyeyê yê li milê rastê dibire.

Wêne li Italyayê deng veda

Kovara "Revolución" jî hemû wêneyên wê rojê yên Korda yên hatine kişandin, wêneyekî Fidel Castro jî bo bergê dihilbijere û bi vî awayî ew wêneyê Che Guevara jî elaqayî baldariyê nayê ditin. Di sala 1967'an de weşangerê Itali Giangiacomo Feltrinelli bi armanca nivîsandina

pirtûkeke li ser şoreşa Kubayê diçe vî welatî û dixwaze wêneyekî baş yê Che Guevara jî peyda bike. Ji xwe wê demê Che Guevara jî bi armanca pêkanîna şoreşekî din çûbû Boliviayê û ew di 9'ê îlona 1967'an de piştî dil tê girtin, tê kuştin. Di vê navberê de Giangiacomo Feltrinelli li Havannayê rayederan re di-



deyne û li ser vê yekê rayedarên hikumetê jî Korda wêneyekî ji bo Feltrinelli dixwazin. Alberto Korda jî wî wêneyê ku hêjayî weşandinê nehatibû ditin, ji arşîva xwe diderine û dide rayedaran. Giangiacomo Feltrinelli di

heman salê de vî wêneyê li Italyayê diweşîne. Di heman demê de çend hezar t-şîrt û posterê bi heman wêneyê dide çapkirin.

"Gerillayê Qehreman"

Ev wêneyê ku Korda navê wî yê fermî weki Gerillayê 'Qehreman' daniye, niha yek ji wêneyên li cihanê herî gelek tê nasîn e û di heman demê de bûye marqeyekê global ya ku bi awayên cude pê firota alavên cuda tê kirin. Wêne li ser bi milyon t-şîrt, plakata, saet, çeqmeq û tiştên din hatiye çapkirin. Ne tenê ev, her wiha wêne bi armanca reklamê tê bikaranîn. Li ser gelek logoyan heman wêne dixuye. Vexwarinên weki cola, cixare, alcopops, şarab û bikini jî di nav de, ev wêne jî bo gelek tiştan weki logo tê bikaranîn. Ne tenê ev, gelên mina yên kurd û filistinîyan di dema çalekiyan de dirahîjin flamayên ew wêne li ser, cihûyên kibbuzava kirine, di çalekiyên jî bo prastina kibbuzên xwe de heman flameyan dihejin. Rayedarên dêran li İngiltireyê jî bo filetiyê belav bike, heman wêneyê bikartînin. Meşeke çepbaran beyî hejandina vî wêneyê derbas nabe.

Wekî din minakên li gor jî dixuye, Gerillayê 'Qehreman' ne tenê jî bo bîndest û şoreşvanan sembolek e. Ew jî bo derdorên din jî modeyek e. Gelek ciwanên ku haya wan jî siyasetê nin e bi bikîniyên ku ew wêne li ser dikewînin avê. Aktorê bi nav û deng yê mîna Johnny Depp, Robbie Williams û gelek repvan jî bi cil û bergên ku wêneyê Che Guevara diderkevin hemberî rojnavevanan. Ji xwe heta niha gelek film bi awayekî rasterast bi piştgiriya Hollywoodê li ser Che Guevara hatine kişandin.

Mafê parastina wêneyê Che Guevara

Alberto Korda di sala 2001'an de di 72 saliya xwe de li Parisê mir. Wêneyê ku wî kişandi bi milyon caran bi armancên cuda hatin çapkirin û belavkirin. Lê belê jî hêla madi ve li wî bi xwe zilikek nehesiliye, ji ber mafê parastina wêneyê ne li cem wî bû. Ji xwe wî çî caran nexwast ku mafê parastinê li cem wî be û

wî digot ku meseleya giring ew e ku ew wêne wek sembolan li nava xelkê tê belavkirin. Digel ku mafê tomarî ne li ba Korda jî bû, wî di sala 2000'an de firmaya Smirnoff ya ku wodka çêdike û ajansa reklamana ya bi nav û deng LoweLintas da dadgehê. Wî sedemê vê yekê jî girêdayî wê kir ku Che Guevara bi xwe ne ji kesên ku alkol dixwaxwê bû jî wê yekê bikaranîna wêneyê wî yê bi vî armancê weki ku hene-

kên xwe bi vî wêneyê diroki bikin bilêv dikir. Her wiha wî ev yek weki hewldanên li dijî îdealaen Che Guevara be bilêv dikir. Li ser vê yekê lihevhatineke jî derveyî dadgehê bi Korda re hate çêkirin û 50 hezar dolar danê. Wî jî ev pere jî bo dermanên zarokên Kubayî kire di xizmetê de. Her wiha dadgeha Londonê ya bi navê High Court di heman demê mafê parastina wêneyê li Konda vegehandin.

Berfîn di payîzê de jî dipişkive



Gimgim (Diha) - Mele Sait Özdemirli ku bi mahlaya Seydayê Xelati nivîsên xwe dinivise, bi navê 'Rewşen', 'Evi û Axin' du pirtûkên helbestên kurdi derxistin.

Xelati ku di sala 1938'an de li Navçeya Xelata Bedlisê jî dayîk bûye û li medreseyan perwerdehî diya, ji sala 1958'an heta niha helbestên kurdi dinivise. Xelati yekem car pirtûka xwe ya bi navê romanek Bînevê Evin derxist. Piştê jî di nav demê de pirtûkên Bêxûbî, Xelat, Civak, Rewşan û Dara Azadî hatin çapkirin û gihîştin ber destê helbesthezên kurdi. Xelati xebatên xwe hin jî bi çûş didomîne. Heri dawî Xelati pirtûkên bi navên 'Rewşan' û 'Evin û Axin' çap kirin. Xelati di van pirtûkan de destanên herêmî, evînen efsaneyî yên kurdi, navdarên Kurd helbest darîjandine. Xelati diyar kir ku di pirtûkên xwe de dixwaze hestên gelê Kurd bide der û pirtûkên xwe jî iyari kesên ji bo azadiya Kurdan canê xwe dane, kir.

'Ji bo bandrolê min pir tekoşin da'

Xelati diyar kir ku ji bo çapkirina pirtûkan seri li Wezareta Çandê daye lê demê dirêj bandrol nedane wî û ew girokirine: "Dibêjin Kurd bi riheti xwe tinin ziman. Lê ez jî vê yekê bawer nakim. Mehekê ez jî bo bandrola pirtûkên xwe ketim dû rayedaran. 3 hezar TL'yê min jî bo vê yekê çû. Pirsgirêka jî me derdixin. Bi zorê be jî min bandrol ji wan stand." Xelati jî bo danasandina pirtûka wê li bajar û navçeyên derdorê semineran bide.

Jin li bazaran şerm dikan



Necmeddin Nêrweyî

Zaxo (Rûdaw) – Ji ber ku li Kurdistanê pirani mîr di dikandaran de kar dikan, jin di dema kirina pêwistiyan xwe yê taybet de rastî pîrsgirêkan cidî tî. Jin ji ber vê rewşê tengezarî û dixwazin ku dikandên ku bi taybetî alavên jinan difroşen hebin û karkerên wan dikan ji jin bin.

Yek ji wan jinên ku di jiyana rojane de rastî van pîrsgirêka tî Şîrin a 24 salî ye. Şîrin dibêje ku dema ew hinek pêwistiyan taybetî ji dikandaran dixwaze, ew ji şerma sor dibe, lê ew nikare tiştê bike, ji ber ku ew wekî din neçare. Şîrin dibêje ku heya niha jin nikarin bi hêsani pêwistiyan xwe wekî alavên ciwankariyê ji dikandaran daxwaz bikin, ji ber ku xwediyên wan hemû mîr in: "Jin

şerm dikan rasterast ji xwediyê dikanê re bibêjin ku ew bincilan, yan pêwistiyan din yê jinan dixwazin." Şîrin nerazibûn xwe li hemberî xwediyên dikanan ji tîne ziman, ji ber ku ew neçarî daxwaza van hewcedariyan bikin, lê hin caran dikandaran bi wan dikanên û ew ji wê demê gelekî ji xwe şerm dikan. Şîrin daxwaz dikanê bazarên taybetî ji bo jinan hebin: "Bi vê yekê pîrsgirêka me jinan ji namîne û di heman demê de kar ji ji hinek jinan re peyda dibe."

Jineke din ku nêrinên xwe di vi derbarî de anî ziman Dêjin Ehmed ya 22 salî. Bahsa serpêhatiyek xwe dikan: "Rojekê em çend hevalên zanîngêhê bi hev re çûn wan bazaran û me hin tişt ji dikanekê kirin. Hevaleka me

daxwaza tiştêki taybetî ji xwediyê dikanê kir û ew pê kenîya. Ji ber vê tevgera dikandaran, me tiştên ku kiribûn ji li dikandaran vegeandî û em ji dikanê derketin." Ehmed dibêje ku pêwîst e rêxistinên jinan ji bi çareserkirina van pîrsgirêkan mijûl bibin û wiha berdewam kir: "Herçend ku li welatên din tiştêki xwezayî be ku xwediyê dikanê zilam an ji jin be, lê hin ji civaka me civakekî feodal e û em negihîştine asta wan welatan."

Ne tenê jin di vi wari de tengasiyan dikşînin, di heman demê de gelek mîr ji gazinan ji ve rewşê dikan. Xwediyên dikanan dibêjin ku ew di firotina alavên jinan de pir zahmetiyan dikşînin. Beyar Selim e xwediyê bazareke firotina pêwistiyan jinan ve yekê piştirast dikan û dibêje: "Pir caran dema jin serdana dikanên me dikan, em his dikan ku ew tiştêki dixwazin, lê şerm dikan ku bibêjin ew çî dixwazin. Ev tişt ji me re ji gelekî nexweş û em ji şerm dikan bipirsîn, ka ew çî dixwazin." Ew dibêje ku gelek caran ew rastî rewşêki wiha hatiye û jin ji ber şermkirinê destvala ji dikanê derketine. Selim dibêje, ku jin di wan dikanan de kar bikin, ji ber ku bi vê yekê hem firotinê alavên jinan we zêde bibe û hem ji jin wê bi dilê xwe daxwaza hewcedariyên xwe bikin.

Keç bê kêr naçin derve

Lenya Zanyar

Silêmanî (Rûdaw) – Li bajarê Silêmaniye keçên Kurd li ser xwe kere digerin. Di çenteyê gelek kecan de ji bili hewcedariyên makyajê kêr ji heye. Ew di wê baweriyê de ne ku kêr wan ji destê kurên niyet xirab rizzar dikan.

Wek keç dibêjin roj bi roj diyardeya destbirin û düketina kecan zêde dibe û hikûmet ji sinorekî jê re danayne. Pîsporên civakî, diyardeya ku keç kêr û tiştên wek kêrê bi çend sedeman ve girêdînin. Wek ji tîrsa destdirêjiya kuran, hestê şerxwazi, teqlit kirin û xwe ispatkirin.

Zeyneb Eli bê kêr naçe derve û herdem kêrê di çentê wê de heye. Sedemê ve yekê şîretên dayika wê ne. Dayika wê ya ku dibêje "Kur wek gur in" ditirse ku bi kurêkan re tesleqe derkeve û keça wê necar bimîne.

Sazan Qadir 23 salî ye û xwendekar e. Ew diyar dikan ku dema kurek dide pey wê û dixwaze destê xwe bavêjiyê, hiç tiştêki nabêje heta nêzik dibe, yekser kêra xwe derdixe û pêşani dide. Sazan bahsa minakêkê ji jiyana xwe dikan û didome: "Rojekê diçûm bazarê, kurekî xwest destê xwe bavêjê min, dema min kêr derxist, bîlez reviya."



(Wêne: Rûdaw)

Diye Mehmeda 20 salî ji xwediyê serpêhatiyêki wiha ye, ku nikare jibir bike. Rojek diçe Pirtûkxaneya Giştî ya Silêmaniye. Li pêşiya deri endamên ewlekariyê çentê wê kontrol dikan. Diye wiha dom dikan: "Dilê min rawestiyabû di nav çente de kêrê bibin û hetka min here. Em ji neçari hildigirin, di wan cihên fermi de kêr bi me re bigrin, wê gelek xirab bibe."

Sawên xwendekara amadeyî ye. Kêr, hevalê wê ye. Lê ew ne ji tîrsa kuran diraje kêrê. "Ez dixwazim xwe wek kurekî pêşan bidim û heza xwe ya keçani li beramber wan derxi-

nim. Di nav kuran de pir tî gotin ku keç lawaz in, ez dixwazim bi wê kêrê ispat bikim ew gotina wan ne rast e."

Divê di çenteyê Sozyar Sebahê de hertim kêrê hebe. Sozyar 28 salî ye û fermanber e. Sozyar, çirokeke xwe ya tehl a bi şofêrêki teksiye re wiha vedibêje: "Kurekî ciwan bû, di neynikê re her berê xwe dida min, piştê min hest kir ne bo wi cihî diçû ku min dixwest, min jê pîrsî baş e tu diçê ku? Got, 'emê herin çihêki xweş.' Min ji kêr derxist û jê re got, 'tu an li vir radiwesti, an kêrê li te dixim. Rawestiya û ez peyabûm.' Êdi bi wi awayî kêr gihaye hewara Sozyar di şerê kuran de."

Pîsporê Derûni Saman Siweyli hilgirtina kêrê ji aliye kecan ve bi çend sedeman ve girê dide û wiha diaxîfe: "Pêwîst e hikûmet yasayekê ji bo sizadana kurên destdirêjker deyne."

Hinek ji wan kecan ji bo beravniyê, hinek bo teqlitkirina filmên rojavayî û beşek ji kecan ji dixwazin bi wê rêyê regeza xwe bigorin bo regeza nêr."

Li gor biryara Lijneya Ewlekariya Parêzgeha Silêmaniye, eger kesek dest bavêje kecan, pênc rojan tî zindan kirin û bi yek milyon dinar ji tî sizadan.

Jina herî bi hêz a cihanê:

Angela Merkel

Serokwezîra Almaniyê Angela Merkel ji aliye kovara Amerîkî Forbes wekî jina herî bi hêz ya cihanê hat hilbijartin. Bi vê yekê siyasetmedara Alman bo cara çarê li pey hev di serê listê de cihê xwe digire. Piştî sala 2005'an ku Wezîra Derve ya Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê (DYA) ya wê demê Condoleezza Rice wekî jina herî bihêz ya cihanê hatibû hilbijartin, Angela Merkel ev çar salên borî ev cih girtiye. Wekî salên borî disa Sheila Bair a Seroka saziya Amerîkî FDIC bû ya duyem û Indra Nooyi ya seroka firmaya Amerîkî PepsiCo ji bû sêyemîn. Jina serokê niha ya DYAYê Michelle Obama ji di rêza 40'î de cih girtiye.

Ji sala 2004'an ve kovara aborî ya Amerîkî Forbes salanê listeya 100 jinên herî bi hêz yê cihanê (The World's 100 Most Powerful



Women) diweşîne. Kriterên hezê ji aliyeke ve derketina di çape-meniye de (bahskirina nav di gotarên rojnameyan de) û heza bi

karê wê ve girêdayî û ji aliye din ve ji bandora siyasi û aborî ya sazi anji welatê ku ew rêvebirîya wê dikan ye.

Listeya jinên herî bi hêz yê cihanê

1. Angela Merkel - Serokwezîra Almaniyê
2. Sheila Bair - Seroka saziya Amerîkî FDIC
3. Indra Nooyi - Seroka firmaya Amerîkî PepsiCo
4. Cynthia Carroll - Seroka firmaya Anglo-American
5. Ho Ching - Jina Serokwezîrê Singapûr
6. Irene Rosenfeld - Seroka firmaya Kraft-Foods
7. Ellen Kullman - Seroka konserna DuPont
8. Angela Braly - Seroka konserna Wellpoint
9. Anne Lauvergeon - Seroka firmaya enerjîyê Areva
10. Lynn Elsenhans - Seroka firmaya neftê Sunoco

Xuşkên biçûk li benda yê mezin namînin

Lenya Mehmed

Silêmanî (Rûdaw) – Kevneşopiya Kurdan ya ku xuşkên mezin berî yê biçûk bizewicin, hêdi hêdi tî guhertin. Êdi xuşkên biçûk ji berî yê mezin dizewecin û ev yek ji dibe sedemê reyaksiyonên cur bi cur. Dimen W. ya 26 salî ji yek ji wan kesan e, ku hersê xuşkên wê yê biçûk berî wê zewicîne. Dimen bi taybetî balê dikîşîne li ser wê yekê, ku li ser zewaca xuşkên wê yê biçûk gelek gotin hatine guhên wê û bi her zewaca xuşkên wê re ketiye di nava tengezarîyê de.

Rewan H. ku 24 salî ye, heman babetê wisa bi bir tîne: „Piştî zewaca xuşka min ya ji min biçûktir, jinbira min ji min pîrs kir, ka gelo sedemê rêdana min ew e, ku ez ji yekî hez dikim û li benda wi dimînim. Ciranan digotin ku digel ez bê-qusûrim ji, çima min rê daye xuşkên xwe yê biçûktir, ku li pêşiya min bizewicin. Bi gotinên bi vi rengî derûniya min tevlihev dibû."

Her wiha Lazo L. ku niha temenê wê 27 salî ye û li zanîngêhê xwendekare bi heman helwestan rû bi rû maye, lê

belê wê qet guh nedaye gotinên li ser wê hatine belavkirin. Ew dibêje ku heta ew xwendina xwe neqedine ew e mîr neke.

Li ser wê kevneşopiye civaknas Heme Ehmed Resûl dibêje ku dema xuşkên biçûk berî xuşkên xwe yê mezin mîr dikan, derûniya xuşkên mezin dikeve rewşêki xerab. Resûl sedemê ve yekê ji wisa dinirxîne: "Asta rawenbiriya ya xelkê kêr e, ji wê yekê li gor wan ne normale, ku temenê keçekê mezin be û hê mîr nekiribe."

Derdên dilê xwe bi nasnavan dibêjin

Rewa Ebdula

Hewlêr (Rûdaw) – Li Başûrê Kurdistanê beşdariya bernamayan radyoyan ji bo gelek kecan buye deriyê wextderbaskirin û hevalpeydakirinê. Lê belê keçên bi riya telefonan beşdari bernamayan radyoyê dibin, ne bi navê xwe yê rast lê belê bi nasnavan beşdariya van bernamayan dikan. Sedema ve rêbazê ya binge-hin ji ew e ku ji bo keç di nava malbat û derdorê de bi zextan re rû bi rû nemînin.

Dilan a 16 salî ji yek ji wan kesan e ku gelek wextê xwe bi guhdari û beşdarbûna bernamayan radyoyê derbas dikan. Radyo buye beşek ji jiyana wê ya rojane. Dilan di wê baweriyê de ye ku ji bo peydakirina hevalekî xort, riya herî rihet radyo ye. Li ser pîrsa ka ew çima ne bi navê xwe yê rast lê belê bi nasnavêki beşdariya bernamayan dikan, dibêje ku sedemê ve yekê ji ber tîrsa ji mal û çanda civakê ye. Dilan herwiha bi bir dixe ku ji sedî 99'ên kecan bi nasavên xwe beşdariya bernamayan radyoyê dikan.

Berpirsên radyoyên herêmi yê bajarê Hewlêrê ji dibêjin ku roj bi roj rêjeya beşdariya kecan ya bernamayan radyoyê pirtir dibe û piraniya van kecan ew kes in, yê ku ji ber zextên malbatê nikarin derkevin derve. Ew ji bili babeta hevalpeydakirinê behsê wê yekê ji dikan ku ji ber di mal de li kecan nayê guhdarîkirin, keç bi riya telefonanê bi radyoyan re derdê dilê xwe divekin.

Evin keçeke 19 salî ye ku bi du nasnavan ango bi nasnavê "Evin" û "Şahînaz" beşdari bernamayan radyoyan dibe. Ew sedemê bikaranîna nasnav wisa bilêv dikan: "Ji ber bi navê min yê nasnav tîkes min nas nake, ez ji ya di dilê xwe de bi xera radyoyan didim der." Ew axaftina xwe wisa bi dawî



tîne: "Ji bo malbat û derdor hem min nas nekin û hem ji girêdayî wê, pîrsgirêkan ji min re nederînin, ez pêwindiyê bi navên nasnav bi radyoyan re çêdikim."

Nîştîman Tenya ya 22 salî ku xwendekara Koleja Adabê ye û bi navê xwe yê rast tevli bernamayan dibe, balê dikîşîne li ser pîrsgirêkeke din ya keçên ku beşdari bernamayan dibin: "Gelek caran dema pêwendiyên kecan bi bernamayan radyoyê re dirêj dibin, bernamayeçêker hejmarên telefonên wan kecan li xortan belav dikan û ev yek ji ne helwesteke şaristani ye." Lê ew ji dibêje ku piraniya kecan ji ber tîrsa malbatê bi nasnavan beşdariya bernamayan dikan û wisa pê de diçe: "Gelek keç bi mebesta zûtir pêwindiyên evîni çêbikin, çend nasnavên cuda li xwe dikan."

Soran Şuşewatfiroş ku xortekî 23 salî ye, bi xwe ji ji temenekî biçûk ve beşdariya bernamayan dikan û bi nasnavan xwe dide nasin. Ew ji di wê fikrê de ye ku armanca ve rêbazê pêwendinên evîni ne û herwiha dibêje ku

bernameçêker hejmara telefonên van beşdaran li derdora xwe belav dikan.

Li gor agahdariyên Wezareta Plandan a Hikûmeta Kurdistanê, bi giştî li Kurdistanê 56 kanalên radyoyê hene. Piraniya van radyoyan girêdayî xetên siyasi yê partîyan e.

Rêvebirê Giştî yê Radyoya Aşti ku ji sala 1998'an ve hatiye damezrandin, Nehro Alayî li ser babetê ve derberîne dikan: "Ji ber malbat giringiyê nadin kecan, ew ji tiştên di dilê xwe de bi riya radyoyê didin der." Ew herwiha behsa rola pîrbûnê ya radyoyan ji dikan û dibêje ku heta niha gelek kesên bi riya radyoyan re hev nas kirine, bûne hevjinên hev.

Psikolog Yûsif Osman ji li Radyoya Aşti bernamayeke li ser derûniyê pêşkêş dikan û ew ji hem sedemê bikaranîna nasnavan girêdayê tîrsa ji malê dikan û hem ji dibêje ku kesin hene ku ji navên xwe hez nakin û dixwazin bi navekî nazik û melodîk beşdariya bernamayan bikin.